




Kovara Sênehane

Hejmar: 14

Payîz 2013

Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran

Ercan YILDIRIM

Edîtor

M. Zahir ERTEKÎN

Lijneya Weşanê

Seyfeddin AYKAÇ

Zafer AÇAR

Ebdulhadi TİMURTAŞ

Ebdulcebbar KAVAK

Tîprêzî û Berg

Seyfeddin AYKAÇ

Web & e- mail

www.nupelda.net

kovaranupelda@gmail.com

Tîf/Fax

Tel: 0432 215 80 60

Navnîşan

Hastane Cad. Donat İş Merkezi

Giriş Kat No:6 Beşyol VAN

Çapxane

Vameda Ofset San.Tic. Ltd. Şti.

Tel: 0432 215 80 60 VAN

www.vameda.com.tr

Biha : 5 TL

Nimroya Hesabê PTT'ê

Muğdat ALADAĞ

6365815

NAVEROK

GEŞT Î GEREKE LI SER QADA FELSEFEYÊ-----	3
WERE ÇÊLŞÊR-----	6
LI QERAXÊ GOLEKÊ-III-----	7
ŞÊX MUŞERREFÊ XUNOKÎ-----	9
JI 'IŞQA FANIYÊ DESTAN BIKÊŞE-----	20
'EBDIREHMANÊ KURÊ 'EWF-----	21
HELBESTA "EŞQA WELAT" A EVDIRREHÎM ZAP SÛ-----	23
MIN GELEK BÊRIYA TE KIRIYE-----	25
DI KURDÎ Î ÎNGİLÎZÎ DE HIN BÊJEYÊN NÊZFORM Î NÊZWATE -----	27
BIBE YA BAŞTIRÎN-----	32
PÎVANÊN JİYANÊ-----	33
JI HERÊMA SEMSURÊ JI GUNDÊ HEWEDÊ (Suvarlı) ÇEND GOTINÊN PÊŞIYAN -----	35
EGIRDEKFIROŞ-----	37
ÇÎROKA HELBESTA "PAYÎZA PAŞÎN" A MELAYÊ HEZ ÎN-----	39
DI'AYEKE CENABÊ 'ELÎ-----	42
AXAYOKÊ BÊDARÎ ŞA'IRÊ REXNEGIR-----	44
SEYÎD ŞEFÎQ ARWASÎ-----	48
STEWREÎN XWEŞIYÊ-----	51
METRAN 'ÎSA YAN JÎ EVÎNA 'ELIYÊ QOLEXAZÎ Î MEYREMA FILE-----	52
JI ROJNÎVÎSKA MIN : Du Kitêb-----	55
PERWEDEHIYA RESÛLÊ XWEDÊ 'ELEYHÎSELAM	
Î TESÎRA WÎ YA LI SER MALBATA WÎ-----	56
ÎRO DÎSA-----	59
ISMÊ TE YÊ ŞÎRÎN-----	60

- Nivîsên tîn şandin nayên vegerandin.
- Her nivîskar berpirsiyarê nivîsa xwe ye.
- Lijneya weşanê, di nivîsan de dikare serrastkirin û guherîne çêbike.

Ji Edîtor

Xwendevanên Hêja!

Dinya bi rojevên xwe yê rojane diqelibe. Li welêt, li rojhilata navîn û li gelek deverên din ên dinyayê bûyerên dilsoz diqewimin. Bivê nevê em jî di nava vê geremolê de cih digirin. Geh bi çav, geh bi rih, geh bi 'eqî û geh bi dil em jî tevî van bûyerên dilêş dibin. Lewra tu însan – ku mirovahiya xwe wenda nekiribe- nikare xwe ji bin bandora van bûyeran derxe û nabe ku di bin tesîra van bûyeran de nemîne û li kêfa xwe binêre. Helbet giraniya êşan di ciyê xwe de ye û agir pêşîn ciyê ku dikevê dide ber xwe û dişewitîne. Em jî weke însan ditengijîn û lava dikin ku di demeke nêz de ev 'ewrên reş li ser waletên me rabin û aştî û aramî bibeve cîhana me.

Kovargerîya Nûpelda bi hêjmara çardem didome. Derketina vê hêjmarê hinekî bi derengî ket. Lewra peydakirin û nivîsandina nivîsên serbixwe, orjînal û bi kalîte ji bo Kurdî ne hêsan e. Weke lijnaya weşanê em dikarin bi dilekî pak bêjin ku derdê me ne tenê derxistina kovarekê ye. Herwiha em li pey derxistina kovareke bi kalîte ne jî. Em bi vê yekê bêtir serê xwe diêşînin. Armanc tenê derxistin û lipeyhevrêzkirina kovarekê bûya, helbet ev tiştekî gelekî hêsan bû. Lêbelê ev kar bê me'rifet û hikmet e. Armanc çiqas bilind bin xebat ewqas biqîmet dibin. Sedema weşandina me dê ne ji bo xatir û dilmayînan be. Nivîsek ku lijnaya weşanê bi tevahî û bi lihevkirin bipejirîne, dê bi rihetî bê weşandin.

Ji ber vê me hewce heye ku em hin rêbazên weşanê di vê hêjmarê de serhev bikin da ku dilê tu hevalî/nivîskarî ji me nemîne. Weke prensîb em ji nivîskar û nivîsan re hin pîvan û standartan dixwazin;

* Divê nivîsên ku ji kovarê re bînan şandin heta niha li tu derê nehatibin weşandin. Dema ku em di hin malper, rojname an kovaran de nivîsên ku ji me re hatine şandin dibînin, êdî em wê nivîsê/wan nivîsan nawaşînin.

* Nivîs divê di qada xwe de orjînal be. Riyeke li ber xwendevan veke, an di qada xwe de bi xwe

riyekê veke. Çi edebiyat be, çi fîzîk, çi 'erdnîgarî be, çi astoronomî be, çi dîrok be û wd. divê tiştekî nû derxîne ber xwendevan da ku xwendevan ji nivîsê agahiyên nû û sûdeke baş bigirin.

* Divê nivîskar ji aliyê rêziman û rastnivîsê ve nivîsa xwe baş kontrol bike û paşê bişîne. Di nivîsên nivîskarên kurd de -xweser jî yê nû- ev pirsgerêk mezin e. Lewma jî edîtorîya kovarê di vî warî de gelekî dibetile û ev betlandina wan ji nivîskaran re jî fêde nade. Loma divê dema ku nivîskar li gorî xwe nivîsa xwe qedand û sererast kir, derfet hebe divê bi pisporekî zimên bide xwendin.

* Nivîsên ku tîne şandin divê dîrî siyaseta rojane bin. Lewra di karê me yê kovargerîyê de palpiştî û alîkariya partîyan tune.

* Divê nivîsên ku tîne şandin bi xawên bin. Yanê ji 'urf û 'edetên Kurdan dîr nebin. Nivîsên dîrî exlaq û ne gorî kevneşopiyên civakê bin nayên weşandin.

* Gelek çîrok û helbest tîne şandin. Ji ber ku hêjmara rûpelên kovarê bi sînor e, em hinekan dineqînin û diweşînin. Yê mayî dikevîne rêzê. Ji ber vê yekê dema ku nivîsek nehat weşandin bila nivîskarê me zû bi zû xwe nexeyidîne. Dibe ku di hêjmarên din de bê weşandin.

* Nivîsên lêkolîneriyê divê bi qaîdeyên lêkolîneriyê bînan nivîsandin. Ev qaîde jî tê zanîn. Di vir de tişta herî girîng danasîna berhemên çavkanî û amadekirina bibliyografîyê ye. Divê em xwe hînî vê rêbazê bikin. Yan na dê nivîsên me kêma û bê delîl bin.

* Herî dawî ez dikarim bêjim ku nivîsên zêdetir hewcedarî pê hene, nivîsên lêkolîneriyê ne. Li ser dîrok, çand, wêje, huner, biyolojî, psikolojî û wd.

Xwendevanên xwoşewîst!

Hêjmara Çardeyan, bi zelal û delaliya xwe ve li ber destê we ye. Em hêvî dikin ku li gorî dilê we be. Heta hêjmareke din bimînin di xêr û xweşiyê de...

M. Zahir ERTEKÎN

GEŞT Û GEREKE LI SER QADA FELSEFEYÊ

Aqîl MIHACIR



Bi şênberbûna daxwaza bîranîn û sipaskirinê ve, di navbereke dirêj a di nava du deman de, hîkmet/zanayî û rasyoneliya li ser rûyên heyînê tev dihatin fêmkirin, peyam û peyxam (messages and revelations) xwerîyane û bi zelaliyane baş dihatin îdraqkirin.

Mirovan, hemû behreyên / îstîdadên xwe bi ava aşîtiyê, bi tava baweriyê, di nav axa spasî û perestînê de terbiye dikir; bi hemû endamên xwe ve hemû pêdiviyên peyxamê bi cî dianî; çî şênber û çî razber, berê hemû ezayên xwe, ber bi armancên wan yê rastîn ve dikir... Yanê serweriya perwerdîtiya ku li ser hebûnê dixuye bi her hêlê ve dipejirand; û bi awayekî şaşmayî û matmayî li kemilîn û xweşkiyên wê mêzedikirin; ew hunerên ji rêzê der, ew sen'etên awarte, ku xemlên navên pîroz yê aferîner in, riya nihêrînê hev yê îbretgir didan, radigandin hevûdu û bi hev didan zanîn; ji wan hunerên ku neynika peyamên razdar in têdigihîştin ku xwediyê wan huneran xwe bi wan navên li ser xwuyangehan didiye naskirin, û bi dayîna ewqas nîmetan ve xwe

didiye hezkirin; rûyê zemîn û yê hemû gerdûnê ji bo hunerên xwe kiriye teşhîrgah; û bi wan hemû huneran ve, bi wan hemû salixkeran ve hebûna xwe, dadweriya xwe, comerdiya xwe, bexşendîtiya xwe, bê mênenediya xwe, didiye zanîn...

Çaxa ku cenabê Brahîm, li Herêma Kenanê, an jî Rihayê çavên xwe di nav ramankoran de, di nav yê ku ji sibehê heya evarê ji peykeran re perestîşê dikin de vekir, mirovatî bûbû evd û bende ji xwedawendên xwînrijên wê heyamê re. Mirovan ne mirovahî dizanibû di hemû jiyana xwe de, ne geşbûna mirovahiyê dikanibûn binasin, ne jî riya mirovbûnê hînbûbûn. Hemû diyan, neçarane ji tevgera xwînxwar û xwînrijan re bende mezin dikirin. Bavan ji sibehê heya evarê, suxreyên wan kedxwaran bi cî dianîn.

Han di rewşeke wisa xirab, wisa giran de Brahîm, dest bi ravekirina buhayê mirovahiyê, dest bi pesinandina fikra azad, dest bi şîrovekirina peyamên razdar û ragîhandina peyxamên pîroz kir.

Li dij hemû çav û mêjîkora, li dij hemû zordestan, li dij hemû nemrûdan, digot êdî bes e bendetî ji wan re! Digot êdî bes e evdîtî ji evdan re! Digot bes e ev qirêjîtî, bes ev dinyayetî:

“Bi rastî, yê/a ku navê Perwerdekar bi bîr tîne û bi perestîna xwe dipaqijîne, xwe digihîne ferehiyê. Lêbelê, ey gelî mirovan, hûn jiyana vê dinyayê dipejirînin; halevku jiyana axretê bi xêrtir û domdar e.”¹

Brahîm bi hemû hurgiliyên xwe ve, li ser peykeran, li ser kirinên Nemrûd ve, li ser niştîgehên asîmên û tevgerên wan, li ser razên heyînê û peyamên wan, heman tişt ji mirovahiyê re vegot, û yek bi yek şîrove û rave kir. Zaro û neviyên wî jî heman tişt kirin bi salan, bi sed salan; herêm bi herêm, welat bi welat geriyan, serdem bi serdem heman şîrove û şiyarî kirin û heman cewr û cefa kişandin...

Li dû vî peywirdarî gelekî şûnda, jîrekî din li makedonyayê têkoşîna heqî û rastiyê, ya xawên û mirovatiyê dikir; lê mîna nemrûdên berê, pîrçemaskên dijminên rohnahiyê, nedixwestin ku ray û ramanên wî di nava gel de belav bibin û di dawiyê de ew mîrxas dardakirin. Li ber sekna daliqandinê, di devê wî zîrekî de ev dur û durdane dipekiyan:

“Ey gelî Atînayê! Daxwazeke min a din ma ji we! Çaxa ku zaroyên min mezin bûn, heke balên xwe ji xawênê zêdetir bidin zengîniyê, çawa ku ez bi we re tîdikoşiyam, hûn jî bi wan ra tîbikoşin, cezayê bidin wan! Heke buhayekî ku li ser wan nîn e, mîna ku li ser wan hebe xwe nîşan bidin; tiştên ku divê qîmetê bidinê lê tew rêzê lê negrin, di rastiyê de biqasî hîçekê bin, lê ku xwe tiştêkî bihesibînin, ez çawa bi we de qeherîme, hûn jî wisa bi wan da bi-qeherin! Heke hûn vîya bikin, hûnê mîna ku li min jî, li xwendegehên min jî qencyê bikin. Niva wexta veqetîna hat. Em di riyên xwe de herin. Ez ber bi mirinê ve, hûn jî ber bi jiyanê ve! Kîjan baş e? Ji xeynê Xwedê ti kes vîya nizane.”²

¹Sûreya E'layê, ayetên 14-17an.

²<http://www.acikders.org.tr/file.php/110/LectureNotes/Ders1-Platon.pdf>; <http://www.servetbasol.com/Articles/savunma.pdf>, lînihêrîn, 25.10.2013.

Li dû van atmosferên rengîn û pîroz şûnda, bi hemû nûnerên xwe ve Heleneya Cîlwekar derket pêşberî dinyaya me ya tefekkure... Li ser çaviya kaniya rastiyê rûnişt. Ji wê rojê û pê ve hizir û keda me, nihêrîn û nirxandina me ya li ser fêmkirina cîhana xwe û ya heyînê, şêlî û tevlihev e; rohnahî û tarîfî di nav hev de ye. Bi hemû rêbazên xwe yên bê rih û bi hemû rêvebirên xwe yên zalim û mêtîngêr ve hatina Romaya Zordest -ku wêya hewa, zilm û çû, li ser nîvenda jîyanê dida rûnişkandin-, ji bo cîhana hizirîn û ji bo jiyana şênber a me mirovan, ev bû qonaxa ruxandina duyem; bi kûrahiyane û ferehiyane em niva ne gihîştin qada paş heyîn û xawênê û ne jî me gerdûna peyambara pîroz û xawêna rûmetbala kir armanc ji tîkoşîn û tevgerînên xwe re...

Ew demên şikestî tune bûn, ax ew demên rûxandî! Ew fetretena, ew qutbûnana, ew heyamên bê ronahî, ew çaxên bê çirûsk, di navbera demên dûr û dirêj de hişên me ji serên me bir, tîgihîştinên me ji qafên me derxistin...

Nûnerên tarîfiyê, yên ku ekla rohnahiyê tam-nekirine, yên ku hîkmet/zanayî nezanîne, yên ku paş û pêşiya heyînê ferqnekirine, yên ku bi awayekî gloverane peyamên li ser hebûnê hatine neqîşandin nedîtine û nexwendine, belê ewana hemû felsefeyê di vî demê de didin destpêkirin û dixwazin ku heyamên berî vî xala demê, yên pîroz û rengîn û zengîn, ji êqil û hişmendiyê veşêrin!...

Gelo heke were gotin ku, felsefeyê bi Arîsto û Platon dest pênekiriye, berevajî felsefe bi wan sekiniye yan jî qediyaye, ma wê pîr bi angaşt be? Têgeha mirovatiyê, armancbûna xawênê, daxwaza dadmendiyê yên di nav “Xweparastin”ê de, ji aliyê van mîratgirên bîxêr va gelo çima nehatiye girtin? Ev mîrata, ji rîspî û ustadê mezin yê felsefeyê Sokrates, ma divê tevhev nehata tewarûs kirin, ne ku hinek an jî çewtane bihata standin?!...

Arîsto bi kirina nav qalibê rasyoneliyê, perspektîfa hîkmetê gelek sînordar kiriye û ew jî hîkmeta pêkhênera agahiyên heyama yekem veqetandiyê û ji heftrengiya prîzmaya Pîsporê Nemirê felsefeyê gelek dûrxistiye... Ji wê heyamê heya serdema navîn, bibêje hema hema bi tevahî, fêhm û tîgihîştin rêşas in û aqil, jîrî, vac û hiş hemû rêwindanin, li wî îqlîmî...

Di riya filitandina felsefeyê ya ji vê rêşasî û rêwindayiyê û ji ya vê berçavka şikestî de, her kê ku ramanek anî zimên, her kê ku nihêrîneke xwerû pêşkêş kir, jiyan li wan hate zîndankirin, bi salan, bi sedsalan, bi serdeman tiştên ku nehatin serê wan neman!

Ev girîya, ev nalîna, ev axîna, ev mêrxasiya bû daxwaza mirov û li her çar koşeyê cîhana mirovatiyê belav bû bi sedsalan! Li hin ciyan deng veda, li hin cihan bersiv stand; lê li gelek deveran tefînî, fetisî, vemirî û encam neda!...

Ne hilma “Vejişkarkar” (s) bû xelaskar ji bo wan dinyayên xeniqîn, ne jî “Mizgîn”ê ew dinyana ji wê bedbînî, reşbînî û xemsariyê filitand bi heqqî... Bi taybetî jî alema Rojava, derdnak bû ji vî derdî; aliyê rojhilat -hîn cî bi cî be jî- xêra agahî û tîrojên peyama Zarathuştra pêş xwe didî û difikirî...

Di vê newalê de, ya herî balkêş ew bû ku, her kê ku di cîhana xwe ya hizirîn de şopgerê nedurust Arîsto, ji xwe re kire pîvang û qistas, her kî ku li ser pêlekên ku wî ramangêrê yekçav û şopgerên wî danîbûn meşiya û hevalbendên xwe jî li ser wana dan meşandin, xwe û rêhevalên xwe, ferseng bi ferseng ji rastiya rasteqînê, ji nihêrîna bi du çavan, ji dîtina peyamên li ser hebûnê, ji xûypakiyê, ji dilovaniyê, ji wekhevîyê û ji dadmendiya dîrxistin berdan...

Dema ku Ravekarê (s) demê, yê heyînê, yê bûyînê gerdûn şerefyab kir, hemû hêvî şikestî, hemû nihêrîn tengijî û hemû çong ji dermên ketî bûn; hemû çav bi perde, hemû aqil kût, hemû dil derdnak û hemû wîjdan reştarî bûn. Wî Şîrovekarî (s) herdu seriyên demê zeftkir û bi hev va pihêt girêda, ew şirîta demê ya ku hemû bûyîn, bûyer, çêbûn, çûyîn, peyam û wate li ser hatine raxistin, wisa bi awayekî ji rêzê der, wisa bi awayekî li ser hemû kûlvarên demê re, rave û şîrove kir ku, yê ku dibêjin ez difikirim giş, mest û sermest bûn, hemû pirs û pirsgerêkên wan hatin bersivandin û çareserkirin.

Çavên ku dixwazin bibînin, di vê çîva dawî ya vê kûlvarê de, heke bibînin ku li ser van pesarên pêçokekî şitilên dîlnizmiyan, dîgerxemiyan û xawêniyan yek bi yek cardî dest bi hişinbûnê kirine, wê demê dikanin fêmbikin ku asoyê me yê fikirînê, dê cardî bi keskesoran bixemilin. Mêjiyên xwezan, wê demê dê cardî bi spasî, bi hizirîn û bi bîranînan va peywirên xwe yê eslî û perpirsiyên xwe yê dîrokî, bi şewazeke herî pak û paqij, yeke herî nazik û nazenîn û yeke herî esîlane bînin zimên û pêk bînin...



WERE ÇÊLŞÊR

A. Sait Pakyürek

Were çêlşêr em bêhal in
Ji hesreta te dinalin
Penc sed sal in çavên me'î rê
Her roj navê te dikalin

Em venagerin me sond xwar
Bila dunya ser me'd bê xar
Va canên me'd vê riyê da
Bila'j bo Wî tim were xar

Bangke cardin mîna berê
Xwe bighîne tu her derê
Van roviyan goştê me xwar
Cardin wan têk qulka berê

Van baxçên me li hêvya te
Van hespana li benda te
Hebkî bike't bilezînî
Çavên me giş li riya te

Her hêl li me reş û tarî
Zad şewitîn giş bûn arî
Heke tu xwe negînî me
Kes nikan vemrîn vî arî

Tu siyarê hespa kehêl
Bigre dîsa şûr û mertêl
Kurm û kêzan em qedandin
Billeh di me de nema hêl

Şûrê te birhana rohnî
Dengê te yê mirovahî
Bila derdora te şîn bibe
Her der bi yekva keskahî

Berê hespa xwe virdake
Cardin neyêr şûnda bike
Pî şikyayî em dilkul in
Bê te quweta me hindik e

LI QERAXÊ GOLEKÊ-III

-Dilê bêtebat -

Zafer Berdestî

Piştî kevirên min ên ser berfê sê meh borîbûn. Nizanim çi pê hatibûn lê dibe ku noqî avê bibûn. Erê niha qeşa golê veheliyabû, berfa wê heliyabû. Rojekê yan jî şevê tevziyek dabû xwe û sist bûbû.

Niha ava wê daweribî, zelal û sar bû, beriya ku hewa germ be û teyr û tû werin bi pêlên bayên germ ve dê hinekî din jî paqijtir û zelaltir bibe. Û paşê, paşê wê ba û barana biharê ve şeniyên golê jî vegerin. Gol dê ji xewê şiyar be, dê bireqise, dê bilive û bileyîze. Tevger, dê li her derê golê tevger hebe. Ne tenê însan, hemû giya û heywan dê bilezînin. Av jî dê bilezîne. Heta dê bireqise, gol wekî ku cara pêşîn e dilive û wekî ku ev şansê wê yê dawiyê ye, dê hemû gotinê xwe di vê demsala biharê de bêje. Belê demsala biharê. Tu dixwazî serê demsala min a biharê bizanibî? Baş e guhdarî bike.

Dem dema xortaniya min e. Dilê min kekel e, ne di şûna xwe de ne jî di singê min de dixwaze bisekine. Dileqe, dilive, diqîre, digere, daxive û bi zingezing e. Ev roj û salên min ên bihara temenê min wisa bi bûyer û rûdan, dan û standin, çûn û hatinê ve tijî ne.



Dixwazim gelek tiştan bêjim, bikim, bidim, bistînim, bidim kirin, dixwazim bêm fêmkirin, herkes bi min bizanibe, dixwazim dinyayê biguherînim û bi ya min dikarim jî, lê kes min fêm nake, dixwazim herkes dengê min bibihîze...

Rojên min ên zanîngehê rojên bi ba û

bager bûn. Erê, rojek ji wan rojan bû. Rewş tevlihev, rojev rakişiyayî, demsal derbihar, hêst hişyar bûn. Amadekarî hebûn, amadekariyên her kes û komî. Biharê, tenê heywan û çêre hişyar nedibûn. Însan jî hişyar dibû. Leza her tiştî zêdetir dibû. Ez jî bi heman awayî dibeziyam. Lez, hinekî din lez diviya. Dem têrê nedikir,

divê zêdetir, zûtir û bileztir bibûya her tişt, û li gorî dilê min bûya. Herkesî gelek tişt dikir. Xebat, meş, çalakî, axaftin, rev, pevçûn, şer... lê gava xirecir çêdibû, pevçûn derdikeş, însanan tedayî li însanan dikir, qad bi rik û hêrsê ve tijî dibûn, şer derdiket, birîndarî, mirin û kuştin çêdibûn ez gelekî heyirî dimam, xemgîn dibûm û jê dûr dimam. Na ne ji tirsê, ne ji şayîşa pêşerojê jî, lê min digo ev tiştên ku însan pê dimirin, dikujin ne bi şer lê bi axaftinê dikarin bên çareserkerin. Ê/ên mafdar bi axaftin, gotin, vegotin, nivîsandin bi kurtasî bi qanîkirinê dê bigihêje/bigihêjin mafê/n xwe. Tenê dem divê. Yanî heke salek, heke deh, heke sed sal be. Lê divê her xebat û kar bi sebir bê kirin. Jixwe mesele jî ev e. ‘Sebir’. Gelek kes û kom sebir nakin, jixwe naxwazin bikin jî. Dixwazin hertiş di dema wan de û bi dilê wan be. Belê dilê min jî wisa bû. Bi ya aqilê min nedikir.

Ji suhbet û axaftin û nîqaşên curbecur û kitêbên stûr şûnde aqilê min piçekî bi ser xwe ve hat. Dilê min da ber xwe û pêre axivî. Ez beziyam, erê erê beziyam. Yanî nereviyam, beziyam. Ji dehan kolanan, sedan kuçeyan, ji rîyan û piran boriyam, nayê bîra min ji çend dîwar û peyarêyan derbas bûm. Heta ku singê min bû wekî landik ez nesekeinim. Di dawiyê de min xwe avête bin siya darekî û nîzanim çend deqe şûnde ez bi xwe ve hatim. Paşê ez hinekî fikirîm. Belê wisa bû. Min go; ‘Em misliman in. Em nikarin çî bê hişê me bikin. Em nikarin çî bê devê me bêjin. Em nikarin çî bê pêşiya me em bipejirînin. Belê çî ji edebiyatê, çî ji hunerê, çî ji zanistê û çî ji felsefê be hemû fikrên tê hişê wêjenasan, hunermendan, zanyaran û filozofan tê hişê me jî lê em nikarin bidin dû her fikr û dilnên di hişê me de nûzayî.

Belê wê rojê şûnde êdî xwîna min piçekî hênîk bibû. Wekî ku ji nû ve dest bi xwendinê bikim ketim nava kitêban. Xwen-

din, zêdetir xwendin...

Îja niha ev bihara te ye. Dema te ya liv û lezê ye. Dema zindîbûn û kelecane ye. Tu yê heta payîzê wisa bi deng û reng bî. Di vê demsala hênîk de ku ava te ji xewa zivistanê hişyar bûye û dilve dixwazim piçekî behsa te bikim û ji te bipirsim.

Çend salî yî nîzanim lê wekî ku tê texmînkirin temenê te gelekî mezin e. Te gelek tişt dîtine û derbas kirine. Ji hev cuda gelek halên te hene. Geh dileyîzî geh disekinî, geh şên î geh tenê yî. Carna bi deng û pejn î carna bi sekn û peng î. Ne şîn û spî yî ne reş û boz î. Ne şîrîn î ne şor î ne tûj î ne tîrş î. Hênîk dikî, paqij dikî, dîtêmîrînî, hêsayî dikî. Li aliyekî din hem xwe diyar nakî û pozbilind î hem jî alîkar î û xizmet dikî. Dikevî ku reng û şiklê wir digirî. Ez mereq dikim tu bi çî eşqê ketiyî, ev hal û rewşên te yên ecêb ji bo çî ye, tu çî vedişêrî, raz û sirên te çî ne?

Ez dizanim tu yê bersiva min nedî. Û ez jî jixwe ne ew ‘arif im ku pîrsê ji te bikim û berî ku pîrs bigihîje te bersiva xwe bidim. Lê dixwazim bi çend kelîmeyan xatirê xwe ji te bixwazim.

Wekî bayê zozanan bû jiyana borî.

Bi lez hat û hêsayî kir û li dû xwe rûyekî qurçimî, bêhneke teng hîşt.

Dîsa rê xuya kir. Bêqirarî, tenêtî û xem da dû xwe.

Rojên xweş û geş, bi deng û ken heta ciyekî

Li ciyekî şûnde dawî çûyîn, veqetîn û gora kûr.

Ji Rebbê alemê dixwazim ez herdem hizûr.

Bi xatirê te...

ŞÊX MUŞERREFÊ XUNOKÎ

M. Xalid Sadînî – Tehsîn Îbrahîm Doskî

JIYANA WÎ

BÛNA WÎ

Şêx Muşerref, sala 1926'ê Mîladî, li bajarê Sêrtê qeza Xesxêrê, li gundê Xunok hatiye dinyayê. Bavê wî Şêx 'Esedê Sanî (duyemîn) ye. Ji ber ku bapîrê bave wî Şêx 'Esedê Ewwel jî mirovekî alim, mutesewif û bi van xasyetan jî navdar bû di deverê de, digotinê Şêx 'Esedê Ewwel. Muşerref kurê Şêx 'Esedê Sanî, ew kurê Şêx 'Ebdullah, ew kurê Şêx Esedê Ewwel, ew jî kurê Hacı ye. Hacı sofîyek bûye ji sofîyên Xalidî. Lê peyrewiya wî nediyar e ka bi çi awa gihîştîye Mewlana Xalid. Hacı li gundekî nêzîkî Xesxêrê rûdinişt. Navê gundî Vêlas e û niha jî milk û emlakê malabata wan li wê derê heye. Binyatê malbatê ji Deşta Dûbanê hatiye, lê ew bixwe jî nizanin ka kengê û ji bo çi binemala wan ji wir hatine.

NAVÊ WÎ

Şêx Muşerref bixwe dide aşkerakirin ku demê ew hatiye ser dinyayê, dayika wî navê Muşerref li ser daniye û her çende ev nav bi dilê bavê wî nebû jî, çunkî rengê tezkîyê tê de heye, belê dayika wî geşbînî û tefa'ul kir ku kurê wê bi îmanê û 'ilmî û çakîyê Muşerref bibe.

Navê wî Muşerref, nave bave wî Şêx 'Esed e. Dayika wî, keça Şêx Muhemmed Emînê kurê Şêx Fehîmê Erwasî, Fatma xanim e. Bavê wî du jin anîbûn. Şêx Muşerref bi tevavî neh xwîşk û bira hebûn. Navê bira û xwîşkên wî jî ev in; Munewwer, Muhemmed Nûrî, Bedreddîn, 'Ubeydullah, Hifzullah, Zimzime, Maşallah, Amîne û 'Efîfe.

Dayika Şêx Muşerref ya duyê jî Behîye xanim, keça Şêx Muhemmed Emînê kurê Şêx Huseynê Basretî bû.

NASNAVÊ WÎ

Şêx Muşerref, di helbesta xwe de nasnavekî, wekî yê Feqiyê Teyran bi kar aniye; "Mîm Fa". Wek tê zanîn yê Feqiyê Teyran "Mîm û Hê" bû. Yê Şêx Muşerref jî "Mîm Fa" ye. Di gelek helbestên xwe de, ev mexles-nasnave ji xwe re bi kar aniye. Wekî di dawîya helbesta xwe ya bi navê "Derdê Bêderman" de weha gotî;

Herwisa di helbesteke din de;

"Her kesê dîtî bi şewket

Ew dizanî ew we naket

Hetta sertiliyan bi zerket

Yek ji wan jî "Mîm Fa" ye"

"Îlahî bike meskenê Mîm û Fa

Ewî baxê hem lezzet û hem sefa"

Dîsa di helbesteke din de jî nasnavê xwe wiha aniye;

"Heçî firqet vexwarî ew

Ji bo Mîm û fa digirî ew

Dizanî nîn e têda xew

Wekî agir di cergê da. "

Ev nasnav di hemî helbestên wî de nîn e, lê di piraniya wan da heye.

CIHÊN LÊ XWENDÎ Û SEYDAYÊN WÎ

Bapîrê wî Şêx Es'ed yekî di <ilmê şerîetê û tesewwufê de zanayekî jêhatî bû. Yêk ji Şêxên terîqeta Neqşebendiyan bû, xîlafet ji Şêx Salihê Sêpkî wergirtibû. Herwisa hevalê Şêx Muhemmed Hezînê Firsafî bû. Kurê wî, yanî bapîrê Şêx Muşerref, Şêx <Ebdullah ew ê bi nasnavê Şêx 'Ebdullahê Atafî dihate nasîn, ew jî ji zana û Şêxên navdarên deverê bû. Îcaza melatîyê li gundê Helenze, ji Mela Mistefayê Bedewî standibû û îcaza terîqetê ji Şêx Husênê Basretî, kurê Şêx Xalidê Zêbarî wergirtibû. Vêca malbata wan, malbateke xwedî medrese û tekyaxane bû. Ji qedîm heta vê demê jî medrese û tekyaxana wan berdewam e.

Demê Muşerref hêj zarok, wî li gundê Xunokê û li nik bavê xwe dest da feqiyatîyê û bavê wî yekemîn seydayê wî bû û ew dibêje: "Min ji kitêba <Izzî heta Camiyê li nik bavê xwe xwendibû"

Seydayên wî yên din ji bilî bavê wî:

1- Mela 'Ebdulhekîmê Helenzî, di sala 1943 z. de miribû:

Mela 'Ebdulhekîm kurê Mela Hesenê kurê Mela Mustefayê kurê Mela Xelîlê Sêrtî ye, li gundê Helenze; ew ê dikeve navbera Sêrtê û Tilloyê de akincî bûbû û li wêrê ders dida feqiyân. Li dûv gotîna Mela Bedreddînê Tilloyî, Şêx Muşerref û birayê xwe Şêx Munewwer û kurmetê wan Mela Tahayê Saruhî pêkve li dorê sala 1942'an hatine Helenze û li nik Mela 'Ebdulhekîmî bûne feqe û hingê Mela Bedreddîn jî feqî bû li wêrê. Şêx Muşerref aşkera dike ku wî ev kitêb li nik Mela 'Ebdulhekîmî xwendin: "Fenarî, di gel Haşîya Qewlê Ehmed û Şerha Semerqendiyê Elûx Mes'ûdî Mîr el-Feth û hindek ji 'sama wez'ê . .

2- Şêx Mustefayê Tilloyî ji binemala Şêx

Îsma'îl Feqîrullahê 'Ebbasî:

Şêx dibêje: "Min hindek dersên Cem'el-cewamiyê li nik wî xwendin."

3- Mela Hemîd kurê Mela Muhemmedê Sêrtê:

Ew yek ji zanayên malbata Mela Xelîlê Sêrtî ye û Şêx Muşerref dibêje: "Min îcaza xwe ji Mela Hemîd wergirtibû."

Îcaza Mela Hemîd ji Mela Husênê kurê 'Ebdullahê Cizîrî yê Farqînî bû, ew ê bi navê Mela Husênê Kîçîk dihat nasîn û îcaza wî jî wekî ya bara pitir ji zanayên Bakûrê Kurdistanê, digihe ya Mela Xelîlê Sêrtî. .

Îcaza wî ya 'Îlmî; Şêx li cihekî dide aşkera- kirin ku, demekî sistî di xwendinê de li nik wî peyda bû û wî hemî kitêbên xwe yên rêzê tamam nekirin, belê di gel hindê jî wî îcaze ji Mela Hemîd wergirt.

Îcaza wî ya terîqetê; Şêx <Ebdullah, izna îrşadê dabû gelek kesan û kurê wî Es'edê duyê yek ji wan bû. Ji bilî îrşada terîqetê ew mirovekê mela û zana jî bû û wî dersên şerîetê jî didane feqiyân û wî gelek ders dabûne herdu kurên xwe Şêx Muşerref û Şêx Munewwer jî û izna terîqetê jî dabû wan...

Ji layê terîqetê ve, wekî me got; Şêx yek ji dûkeftiyên terîqeta Neqşebendiyan bû û îcaza wî hem ji bavê wî bû ku bi rêka Şêxên Basretê digihe Mewlana Xalidê Neqşebendî û hem ji Şêx Mistefa Kemaleddînê Erbilî bû ku dîsa digihe Mewlana Xalid. Şêx Muşerref ji Şêx Mustefa Kemaleddînê Erbilî, wî ji bave xwe Şêx Ebabekir Xiyaseddîn, wî jî ji Şêx Osmanê Tawîle û Şêx Osman jî ji Mewlana Xalid wergirtiye. Bi vî awayî du caran îcaza terîqetê wergirtiye.

Ji ber ku Şêxê wî li Hewlêr/Erbîlê bû, çend carekan ew derbasî Kurdîstana 'Îraqê bûbû û li devera Bahdînan jî wî nasîn û hevalînî di gel çend kesekên navdar hebû. Wekî: Mela Ehmedê kurê 'Ebdulxaliqê Akreyî, ew ê ders li Zaxo didane feqiyân û Şêx Memdûhê Birîfkî û Şêx Muhemmedê Memanî.

ZEWAÇ Î ZAROKÊN WÎ

Şêx Muşerref du caran zewici bû. Cara yekemîn, bi keça Şêx Muhemmed Salihê Erwasî Safiye Xanimê re ku neviya Şêx Fehîm Erwasî bû. Yanî keçxala wî bû. Di sala 1946'an de zewicibûn û ji vê zewacê du kur; Muhemmed Nazim û Muhemmed Asim û keçek; Cennetî Xanim hebûn.

Di sala 1961'ê de bi keça Mela Xelîlê Sêrtî Xanimê re zewaca duyemîn kir û ji wê zewacê jî pênc kur; Muhemmed Şîfa, Muhemmed Wefa, 'Ebdullah, Muhemmed Se'îd û Muhemmed Samî hebûn.

Ev zarokên Şêx Muşerref hemî jî li jiyane ne û li ser rêya bav û bapîrên xwe ne. Nemaze Muhemmed Wefa postnişînê malbata xwe ye û li Xunokê nêzikî 50 feqî hene...

PIRSGIRÊKA LEŞKERIYÊ Î MIŞEXTÎBÛN

Dema Şêx Muşerref xwendina xwe ya medresê qedandiye û zewiciye qederê 3-4 salan mişext bûye û çûye gundekî nêzikî Zaxo Berzûriyan bi cih bûye. Sebebê vê mişextbûnê jî 'eskerî bûye. Lewra Şêx, ji kirin û kawdanên komara Tirkîyê gelek nerehet bûye. Ji ber ku nexwestiye bibe şîrîkê xirabiyên dewletê, malbata xwe hêlase û çûye. Di dema vê mişextbûna xwe de, Şêx Mustefayê Erbilî jî naskiriye û bûye peyrewê wî jî. Lêbelê hem xerîbiya dêwbavan û hem jî ya dost û yaran nehêlase ew li wir gelek bîmîne. Ji Berzûriyan gelek name bo bave xwe, bo dostê xwe Mela Bedreddîn û dostên xwe yên din jî hinartine. Bavê wî Şêx 'Esed, hin mirov hinartine bi dûv re û wî jî bave xwe neşikan-diye û ziviriye. Piştî sê-çar salên firarê hatiye û çûye 'eskeriyê jî. Lê hêj 'eskeriya wî temam nebûye, zabîtekî xêrxwaz lê peyda dibe û wî rê dike mala wî. Hêj 6 meh jî 'eskeriyê mayî tê û ji wî derdê mezin xilas dibe.

MELATÎ Î MUDERRISIYA WÎ

Piştî wergirtina îcaza Melatîyê û ji xilasbûna leşkeriyê Şêx Muşerref, li gundekî Berwarî bi navê Rûbarîyan dest bi karê Melatîyê dike. Her li wî gundî medreseke jî vedikin û dersê jî dide feqîyan. Çend salekê dirêj, ji sala 1953'an heta 1977'an nêzikî bîst û çar salan, ew melatî û muderrisya

gundê Rûbarê dike. Paşê piştî mirina birayê xwe, ew ji Rûbarê vegeriya gundê Xunokê û li cihê bavê xwe bû mela û muderris û jiyana xwe ya mayî hemî wî li wêrê borand.

Wî hemî jiyana xwe di xizmeta 'ilm û medresê, terîqet û tesewwîfê de, bi awayekî serfiraz û rûspî derbas kiriye.

FEQIYÊN KU ÎCAZE DAYÊ

Helbet mirovekî 55 salan di xizmeta medrese û xwendina feqîyan de be, dê bi sedan feqîyan bide xwendin. Jixwe, dema li Rûbarîyan hemî dema 50-60 feqe hebûne. Herwisa li Xunok jî çu caran medresa wî kêmkî 40-50 feqîyan nebûye. Çenda ku Şêx Muşerref bi sedan feqe hebûne, ji ber tewazû û dîlnizmiya xwe, dema feqîyên wî nêzikî icazê dibûn, ew di hinartine cem dostên xwe ku kitêbên dawiyê ew pê bidin xwendin û icazê bidinê. Ji ber hindê jî gelek icaze nedayîne. Çend feqîyên li ber destê wî yê pîroz, icaze wergirtine ev in;

Şêx Muhemmed Nûrî

Mela 'Ebdurrehmanê Mêjingirî

Mela 'Ebdulhemîdê Hêşetî

Mela Mehmûdê Kerafî

Mela Mehmûdê Mardînî

Mela Îsmâîl (Niha li Medînê ye)

Şêx 'Ebdulhekîm

Şêx Muhemmed Salih

Şêx Muhemmed Şefîq

Mela Edhemê Xunokî

Mela 'Ebdurrehmanê Sîsemî

Mela 'Ebdurrehmanê Kîpî

Şêx Hîfzullah (Birayê wî)

Mela 'Ebdulletîfê Meytîsî

Şêx Muhemmed Nazim.

Helbet yên me şiyaye tesbît bikin ev çend in, lê bi qene'eta me gelekên din jî hene ku dê ji niha pêve peyda bibin...

KESAYETIYA WÎ

Şêx Muşerref, mirovekî zana, edîb, muderris, şêxê terîqetê û piştî bave xwe mezinê malbat û gundê xwe û rîspiyekî devera Berwarê û hemî Sêrtê bû. Lê li gel van wesfan hemiyan, ew jî serapa edeb, heya, ciwanmerdî û dîlnizmî bû. Herkesê ew dîtiye, li gel axivtiye û li sohbeta wî peyda bûye, heyrânî mirovatiya wî û danûstandina wî ya insanî bûye. Çi kesê ku me di derbareyî Şêx Muşerref de pirsek jêkirî, bi heyrânî û stayiş û başî behsa wî kiriye. Em dixawzin li vê derê gotinê bo dost, heval, feqe û xizmetkarekî wî bihêlin.

Hevalê wî yê feqatiyê û paşê jî hevlingê wî û dostê wî yê heta mirinê Mela Bedreddîn Tilloyî, bo me wiha behsa wî kir; “Ew mirovekî bêhempa bû. Însanekî xweşerm û bi heya bû. Me destbiratiya axretî bi hev re kiribû û hindî ew sax bû, min nedîtiye dilê mirovekê hêlabe. Gelek hez ji ‘ilm û zanîne dîkir. Çu caran gotinên nexweş û bêwate ji devê wî dernediketin. Mirovekî wefakar û gelek sadiq bû. Herwisa gelek merd jî bû. Dema em li Helenzê, me bi hevra dixwend, rewşa wî ji ya me çêtir bû. Ji ber hindê jî, dema ez derdiketim bazarê kîsk/cizdana xwe dida min û digot; ev e ya te ye, hindî dixwazî mesref bike, heke ma, bo min bîne.”

Mela Bedreddîn gelek gotinên din yên wiha bi stayiş di derheqa Şêx Muşerref de kirin. Kurê Şêx Muşerref, Muhammed Şîfa got; “Min carekê gote Mela Bedreddîn; Seyda, cenabê te û bave min evqas hevalîniyeke dirêj kir, gelo qe carekê dilê we ji hev maye? Mela Bedreddîn li min zivîrî û got; “Ma bavê te dihêle ku dilê yekî jê bimîne. Qe dihêle ku mirov jê silbibe.”

Ew mirovekî merd bûye û di nav dostên xwe de jî, di nav xelkê de jî wisa hatiye zanîn û nasîn. Mela Burhan, -ku zanayekî navdar e di hemî Kurdistanê Bakur de û nemaze di nav ehlê medresê de- jî, derbareyî merdiniya Şêx Muşerref de gelek tiştên balkêş bo me gotin. Ew dibêje; “Carekê em çend hevaleyek bi hev re çûbûne xwaringehê û me xwarin xwar. Şêx Muşerref hez dîkir ku ew hisaba

xwarina me bide. Cuzdanka xwe derxist û da min, got; ‘Dewlet serê xwe ji vir bide.’ Min jî gotê; ‘Ez benî hema tu bide.’ Got, ‘Ez hisab-kitabê nizanim, hema ji cuzdanka min bedela min bide. Birastî jî ew mirovekî wisa bû, çu ‘eleqe bi hisab û kitaba diravî ve nebû.”

Şêx Muşerref, mirovekî gelek bi sebr û tehemmul jî bûye. Di sala 2007 meha Tebaxê de, qezayeke mezin çêdibe û kurekî wî li gel zavayê wî emrê Xwedê dîkin. Li hevberî vê qeza mezin Şêx Muşerref sebr û tehemmuleke bêhisab dike û ji xerî xemginiyeke camêrane kesek çu diyardeyên din jê nabîne.

Dîsa Mela Burhan bo me got; “Ew melekun fî suretul insan bû. Salim, waqur, ‘arif û hessas. Dema diaxivî durr û yaqut ji devê wî dibariyan. Min gelek ji wî istifade kiriye; edeb, terbiye, exlaq û wesfên ewliyanê li ba wî hebûn. Kesekê nedîtiye ku ew hers bûye. Xweda jê razî be.”

Şêx Muşerref mirovekî, dilnerm, bimer-hemet, dîlpêveh û gelek sakîn bûye. Ne çu caran kesekê kenîna wî dîtiye û ne jî ‘enîrîn, hêrsbûn û kerbvebûna wî dîtiye.

Mela Se’îdê Muezzin -ku di hemî jiyana xwe de, wekî xizmetkarekê li gel şêx bûye- dibêje; “Exlaqê Şêx, wekî exlaqê Pêxember ‘Eleyhisselam bû. Ji bo zarokan, hem zarokên xwe û hem yên gundiyan gelek bi merhemet û dîlpêveh bû. Ji ber xatirê Resûlullah, gelek hez ji seyyîdan dîkir. Qedrê wan gelek digirt.”

Qet hez ji bê simbêliyê, serkolîyê û cilûbergên xemilî nedikir. Heta carekê paltoyekî gelek xweşik û jêhatî jê re hatibû. Bi gotina Mela Burhan gotiye ku, ev sakoye hindî delal e ku divê ez bihêlim û ji xwe kiriye û bi diyarî daye kesekî din.

Feqiyekî Şêx Muşerref, ku salekê li gundê Rûbariyan li ber destê wî xwendiyê, di derbarê Şêx de wiha dibêje: “Şêx Muşerref insanekî wisa bû ku, di ‘esrê xwe de, di Kurdistanê de, di dîtina xwe de, di axivtin û sohbeta xwe de, di nerm û helimiya xwe de kesekî wekî wî nebû. Hem di tesewwîfê de, hem di ‘ilmê de ehlê kerametê bû. Min gelek kerametên wî dîtine, lê ji ber ku wî heznedikir, ez nabêjim.

Gelek hez ji sulehayê selefîn û ewladê resûl dikir. Gerçî di nav xelkê de meyl û xerezanê nedikir, belê gelek hez ji feqiyan û aliman û ehlê medresê dikir.”

Şêx Muşerref, di gelek helbestên xwe de behsa qencî û başiya ‘ilm û xwendinê dike. Herwekî di vê beyta han de jî gotî;

“Ferqa insanî ji heywanî xwendin e û edeb

Mirovê xwenda şîrîn e çi ‘Ecem bî çi ‘Ereb”

Şêx Muşerref, li gel veqar, nerm û helîmî û micidiya xwe jî, mirovekî keyfxweş û rûgeş jî bûye. Hem nasyarên wî û hem jî helbestên wî vê diyar dikin. Mesela di beyteke xwe de dibêje;

“Tu gihan e, sêv xwiyan e, vê bizane ey lebîb,

Derdê zik derdek giran e, pir xerîb e, pir ‘ecîb”

Yan di vê beyta xwe de, dilxwaziya çayeke xweş dike:

“Dilê min çayekê mehbûb û taze

Li ser kehniya rezan îsev dixwaze”

Şêx Muşerref ji bilî Kurdî, ‘Erebî, Farisî û Tirkî, Osmanî jî baş dizanî û peywendiyê xurt li gel edebiyata Osmanî jî hebûye. Lê keyfa wî bi kirin û kawdanên Komara Tirkîyê nedihat û hindî jî dest hatiye xwe ji dewletê vekêşaye û çu caran xwe têkilî karûbarên dewletê nekiriye. Heta tê gotin ku qet dengê xwe nedaye û xwe têkilî siyaseta jî nedikir.

Hindî ku em li vir binivîsin wesf û xasyet û başiyên Şêxê muhterem xilas nabin. Xwedê wî di nav qencên xwe de heşir bike...

JIYANA REWŞENBÎRÎ

Ji bilî ,ilmê şerî‘et û terîqetê, Şêx Muşerref destekê dirêj di edebiyatê de jî hebû. Ji ber ku wî çar ziman dizanîn; Kurdî, ‘Erebî, Farisî û Tirkî xeyal û zimanê wî yê edebî berfireh bû û şîyanên wî li ser nivîsîn û vehandinê zêde û xurt bûn. Wî hemî jiyan xwe bi xwendin, dersdan, tefekkür û ‘ibadetê ve derbas kiribû. Gelek hez ji edebiyata Kurdî jî dikir û bi gotina nasyarên wî bi sedcaran zêdetir, Nehcu-

lenama Mela Xelîlê Sêrtî û Mewlîda Mela Huseynê Bateyî xwendiyê.

Yek ji xasyetên Şêxî yên berçav tewazu’ bû û ew gelek ji nav û deng û şuhretê direvî. Lew wî qet qebûl nedikir şî’rên wî belav bibin û di dezgehên ragihandinê da bêne weşandin. Ji ber hindê jî wî, di jiyana xwe de qet hizra çapkirina berhemê xwe nedikir. Demê wî destnivîsa şî’rên xwe dida kesekî jî, wî li ser dikire şert ku ew belav nekin! Belê di ser hindê jî re şî’rên wî ji destekî bo destekî belav dibûn. Lewra şî’rên wî gelek xweşxwîn û ji bo jiberkirinê hêsan bûn. Gelek mela û feqiyan helbestên wî ji bo xwe ji ber dikirin û dixwendin.

Şêx Muşerref di jiyana xwe de destûr nedaye ku berhemê wî bîn çapkirin. Lê piştî Şêx çûye rehmetê û mesela î‘cab û xurûrê li halê nemaye, ew tiştê wî nivîsî bo milkê milletî û êdî dem hat ew belav bibe. Ji ber hindê me jî pêwîst dît ku em hinekê ji berhemê wî belav bikin di nav milletê wî de.

BERHEMÊN WÎ

Şêx Muşerref di demeke sext û dijwar de jiyabû. Di wê demê de zimanê Kurdî qedexê bû, axiftin û nivîsîna Kurdî ji bo xwediyê xwe, wek tawan dihate dîtin û sebebê girtin, hebskirin û ceza wergirtinê bû. Herwisa gotina dersên dînî jî qedexê bûn. Jixwe, dema istibdadê û zulm û zoriyê bû. Mizgeft dikirine extexane, medrese û tekyaxane dikirine xirabe. Belê di gel vê çendê jî, hem malbata Şêx Muşerref li medrese û tekyaxana xwe xweyî bûn, hem jî ew bixwe yê berdewam bû li ser nivîsîna bi Kurdî û dana dersan jî bo feqiyan. Lew bi hizra me Şêx -wekî gelek seydayên dî yên ku xwe havêtiye vê meydanê- yek ji wan xebatkerên veşartî ye yên xêra parastina ziman û edebiyata Kurdî li rojên reş bo dizivire. Hêjayî gotinêye em bêjin: Şêxî ne bi tenê berhemê xwe yê kurdî nivîsiye belkî wî berhemê çend klasîkên dî jî bi xetê xwe yê ciwan nivîsiye.

DÎWAN

Ew dîwana şî‘ran e ji 457 berperên destnivîs pêk tê. Şî‘rên vê dîwanê bi çar zimanan e, bara pitir

jê bi ‘Erebî ne. Di dîwana Şêx Muşerref de, nêzîkî 300 helbestan hene; ji van helbestan 75 bi Kurdî ne û çendek bi Farisî ne û yêk jî bi Tirkî ye. Yên mayîn jî hemî bi zimanê ‘Erebî ne.

Ji awayê xwe ve jî, munacat, na’at, mersiye, qesîde û gelek helbestên wî jî nesîhet û serf û nehî in ji bo feqîyan. Hin helbestên wî jî name ne, ji bo dost û nasên xwe nivîsîne. Mixabin heta vê demê dîwana wî bi awayekî rêkûpêk nehatiye belav kirin. Di vê kitêbê de me, ji helbestên Şêx Muşerref yên Kurdî, Farisî û Tirkî veguhastine û yên ‘Erebî me cuda kirine û belkî wan li paşerojê di kitêbeke taybet de -eger Xwedê hez bike- berhev bikin.

ŞEKLÊ HELBESTA WÎ

Demê em berê xwe didi helbesta klasîk ya Kurmancî, li Bakurê Kurdistanê, bi taybetî kesên bi terîqetên tesewwufê ve girêdayî, em dibînin ku babetê berahiyê û dûmahiyê medhên şêxê xwe ne û gelek şairan şî’ra xwe hemî bo medhên Şêxê xwe terxan kiriye. Lew dê bîni ew li dor yek babetî her dizivirin û dizivirin. Helbet ev tişt jî lawaziyê diêxite şî’rên wan. Em dibînin ku şî’rên gelek ji wan, ji layê weznê ve jî lawaz in. Belê şî’rên Şêx Muşerref, ji bin vî qa’îdeyê giştî derdikevin û şî’rên wî ji layê weznê ve bê kêmasî ne û ji layê babetan ve jî gelek babet vegirtîne.

Şêx Muşerref hemî helbestên xwe bi wezn û qafiyê vehandine. Di nava helbesta wî de qesîde, mersiye, ne’et cihekî gelek girîng digirin. Piraniya helbestên xwe li ser van deryayan vehandine; Derya el-remel el-musemmen el-mehzûf, derya el-remel el-musemmen el-salim, derya el-hezec el-mused-des el-mehzûf û el-hezec el-musemmen el-salim.

USLÛB Î ZIMANÊ HELBESTÊN WÎ

Her ji destpêka jiyana xwe ya edebî Şêx Muşerref, nasnavê xwe yê helbestvanî kiribû “Mîm Fa”. Wek îşaret bo du herfan jî navê xwe û belkî wî ev çende wek çavlêkirin be ji bo Feqiyê Teyran. Lewra nasnavê F. Teyran jî “Mîm û Hê” bû. Ev jî girêdana mukuma Şêx Muşerref, bi edebiyata klasîk ya Kurdî ve jî bo me berçav diket.

Helbestên wî, bi zimanekî sade û sivik hatine vehandin. Tiştê bûye egera hindê ku şî’rên wî bikevine ser ezmanê xelkê, li devera Sêrtê û bi deng bêne gotin ji layê sofî û feqîyan ve. Wî di helbestên xwe de çu caran zimanekî xemilandî û wate muxlaq bi kar neaniye. Herdem bi zimanê sofîyan, feqîyan û gundiyan nivîsiye. Ji ber hindê jî gelek peyv û termên herêmî, nemaze yên herêma Sêrtê û Berwarê di helbestên wî de hene. Wekî; li cihê “bihata yan hatiba” bi devoka Berwarê “bihta”, li cihê “biçûwa” “biçwa”, li cihê “nehatiba” “nehta”, li cihê “dibêjî” “dêjî”, li cihê “nimêj” “mêj” û wekî van peyvên; “mestir, lîztin û hwd” nivîsiye û qet xwe ji zimanê gelêrî nedaye paş. Ev jî xasyeteke zimanê helbesta Şêx Muşerref e...

Hin helbestên Şêxî jî wergerên helbestên Mewlana Xalidê Şehrezorî ne û wî bi xwe ev tişt diyarkiriyê.

NAVEROKA HELBESTÊN WÎ

Naveroka helbestên Şêx Muşerref gelek rengîn e. Bara pitir helbestên wî ne’et û munacat û mersiye ne. Ji ber ku muhebbet û evîndariyeke zêde ji bo Pêxember Eleyhîsselam hebûye, gelek helbestên xwe rasterast jib o medhê pêxemberê Îslamê vehandine. Wekî ne’eteka dirêj wiha dest pê dike;

“Ya Resulellah tû yî meqsûd ji hecca Hacıyan

Ya Resulellah tû yî heq dergehê muhtaciya

Her dikit qesda te yê gunneh mezin bê hed kirî

Her tû yî ya seyyîdê ‘alem hewara ‘asiyan”

Ji bilî van helbestan jî dawîya piraniya helbestên xwe bi vê beytê xilaskiriyê;

“Sed selat û sed selam li rewza te bin ya seyyidî

Al û eshab hem di gel bin hem kesê ji benda te”

Ji ber ku hemî şî’rên Şêx Muşerref yan pîriya wan bi hilkeftên şexsî û civakî ve di girêdayî ne, em dişêyn bêjin: wî bi van helbestên xwe dîrokeke civakî ya herêmî nivîsiye û gelek hilkeftên taybet

yên xwe û hevalên xwe bi şîr qeyd kirine. Wekî hil-keftên: geşt û seyran û dawet û bûna zarok û mirina kesên navdar û hwd. Ji bo mînak, ji helbestên di vê kitêbê de, helbesta hejmare 20. li ser Xwedêdana kurê xwe, 22. li ser sunnetkirina zarokên xwe, 31. li ser Şêx Memdûhê Birîfkanî, 44. li ser kurê xwe Nazim, 50. li ser ‘eskeriya xwe, 64. li ser neviyê xwe û neviyê birayê xwe kurê Şêx Hemdullah nivîsiye.

Gelek helbestên wî name ne. Wekî vê helbesta ji bo dostê xwe yê axretî Mela Bedreddîn hinarî û wiha dest pê diket;

“Ela ey Bedreddîn nûra du çavan

Bi min navê te şêrîntir ji navan

Dişînim ez tijî gulê Xunokê

Ji bona te gelek şêrîn silavan”

Yan wekî vê helbesta ji bo Mela Hesên hinarî û wiha dest pê dike;

“Îlahî tu selamê min li ser mela Hesên danê

Bibarîni li wî daim wekî baranê Nîsanê”

Herwekî me gotî, piraniya helbestên wî li ser hin hilkevînan, bûyeran, bûna zarokan, wefatên dost û yaran, bîranînen şêx û meşayîxan hatine nivîsîn. Jixwe Şêxî, hema hema di ser yan binê hemî helbestên xwe de têbîniyên xwe nivîsîne ka ew helbest bi çi munasebetî vehandiye....

Lê ji bîlî van jî hin helbestên wî rasterast pend û şîret û nesîhet in ji bo feqiyan. Nemaze ew helbesta bi navê “Kitêba Gûz û Mewîj” destûrnaneyeke girîng e ji bo perwerdê û ders xwendina feqiyan. Ew helbest wiha dest pê dike;

“Gelî feqiyan gelî feqiyan nezer kin

Heçî bêjim bizanin hem ji ber kin

Çiku ez bo we tehqîqa evîn im

Muhibbek sadiq im hem xemrevîn im

Kelamê min xweş û pir nazdar e

Şîrîn e taze ye wek nûbihar e”

Û bi vî awayî heta dawiyê şîretan li feqiyan dike ku bi qene’eta me felsefeya Şêx Muşerref ya di derbareyê tedrîsata medresê de berbiçav dike. Girîngiya wê jî ew e.

Helbet dîwaneke ji 300 helbestan pêk bê, dê babetên curbicur tede hebin. Ji xwe Şêxî li ser Ava Miksê, Hingivîne Sanûhê, xweşiya çayeka li nav rezî jî nivîsiye.

BERHEMÊN DIN

KITÊBA HACÎ EHMED

Bi zimanê Kurdî ye, destnivîsa wê ku bi xetê wî bi xwe ye, ji 105 berperan pêk tê, tede behsa zincîra Şêxên xwe yê terîqetê dike û hindî me bihîstî û dîtî, Şêx Muşerref yekemîn kes e ku zincîra Şêxên terîqetê bi Kurdî nivîsiye. Her cara Şêxên Kurd îcazên xwe çi bi nivîsîn be yan jî çi bi vehandin be, yan bi Farisî yan jî bi ,Erebî danîne. Belê Şêx Muşerref, ev qa’ide şikandiye û ev karê xwe bi Kurmancîyeke rewan nivîsiye.

Di vê kitêba xwe de, ew çend bîrhatin û zanînan li dor bavê xwe Şêx Es’edî û birayê xwe Şêx Munewwer jî vedigêre.

KITÊBA MELA ‘ELADÎN

Ev nameyeke ku ji 117 rupelên destnivîsa wî bi xwe ye û li ser ‘itiqad û Eqîdê ye. Wekî nesîhetnamê jî bo eqreba û muntisibê xwe Mela ‘Eladîn nivîsiye.

TEHIYYETUL ETFAL

Lêkanîneke Zurûfa Mela Yûnûsê Her-qetênî ye û 64 beyt e. Wekî tê zanîn Zurûf li ser Nehwê ye û Şêxê rehmetî, ji bo ku feqiyên wî bişên vê kitêbê bi awayekî sanahî ji ber bikin, ev babet bi helbestkî nivîsiye.

ŞERHA LUC CETUL ESRAR

Herwekî tê zanîn “Luccetul Esrar” ber-hemeke Mela Camî ye. Şêx Muşerref li ser daxwaza dostê xwe Mela Burhanê Tilloyî şerheke ji bo vê kitêbê nivîsiye. Manzûmeya Mela Camî bi Farisî ye, şerha Şêx Muşerref jî bi awayê klasîk şerhdanîna li bin her beytekê ye, wateya wê bi ‘Erebî hatiye nivîsîn.

‘EQÎDA ÎMANÊ

Berhemeke wî bi xwe nîn e, ji ‘Îanê wergêraye Kurdî.

MEKTÛBAT

Ev, ew name ne yên Şêxî ji bo hevalên xwe hinartin. Bi taybetî jî hevalê xwe yê nêzîk Mela Bedreddînê Tilloyî û ew yên hatine komkirin û lêkdan ji layê ‘Ebdurreqîbê kurê Mela ‘Ebdullahê Berwarî li sala 1422’ê mişextî 2001’ê z. û bara pitir ji van nameyan bi zimanê ‘Erebî ne.

Destnivîsa vê kitêbê ji 217 berperan pêk tê.

Ji bilî nameyên ji bo Mela Bedreddîn hinar-tin jî, gelek nameyên din hene ku, hem ji bo malbata xwe, hem ji bo dost û nasên xwe û gelek jî ji metlûb û mensûbên xwe hinartine. Gelek ji van nameyan Dr. ‘Ednan Memduhoglu berhev kirine û ji kerema xwe pêşkêşî me jî kirine.

Berhemên Şêx Muşerref yên xweser ev in, lê jibilî van jî hin helbestên wî hene, wekî; Kitêba Gûz û Mewîj, Ya Eyyuhel Weled (Ji bo kurê xwe Muhammed Wefa, nesihetnameyek e) û hwd. jî mirov dişê berhemên xweser qebûl bike. Lê ew hemî di nava Dîwanê de ne û heke Xwedê hez bike, em dê rojekê berhemên wî hemî jî çapkirî bibînin...

NEXWEŞÎ Û WEFATA WÎ

Şêx Muşerref, di Kanûna Paşî ya 2008’an de nexweş dikeve. Nesaxiya wî giran e, bêhal e. Dibin Stenbolê ji bo tedawiyê. Nesaxî hewaleyê Xweda ye û dizivîrînin. Dema ji Stenbolê dizivire, Mela Burhanê dostê wî diçe serdana wî. Dibêje Mela Burhan; “Birawo, me çeper berdaye, bextê we de me hûn çeperên xwe bernedin.” Çend roj piştî vê sohbeta wekî ya Ebû Reyhanê Bîrûnî, Şêx Muşerref çeperê xwe bi temamî berdide û diçe ba Pêxemberê xwe yê ku gelek hez jê dikir.

Belê, şeva Mewlûdê 12 Rebî’ulewwela sala 1429 mişextî, yanî 20’ê Adara sala 2008 z. li bajêrê Sêrtê çû ber dîlovaniya Xwedê. Her çenda ku ew li Xesxêrê akincî jî bû, wî li nexweşxana Sêrtê, emrê Îlahî bi cih anî. Hevalê wî Mela Bedreddînê Tilloyî ev malika tarixa ebcedî bo nivîsiye; “Liye rizwan rebî ebd alebd”

CIHÊ QEBRA WÎ

Li mizgefta merkezî ya Sêrtê nimêj li ser wî hate kirin û li dûv wesiyeta wî ew li goristana Şêx Suleymanî ya dîrokî, li nêzîkî Mela Xelîlê Sêrtî hate veşartin. Ji ber ku Şêx Muşerref gelek hez ji Mela Xelîlê Sêrtî dikir. Di jiyana xwe de bi sedan caran zêdetir, kitêbên wî bi ders dabûne feqiyên xwe û bi sedan caran hema ji bo xwe Nehcul Enama wî xwendibû. Ji ber hindê jî xwestibû di darulbeqayê de bibe cînarê wî...

PEYREWÊN WÎ

Seydayê rehmetî Şêx Muşerref, ji bilî 10-15 sal feqetîya xwe, nêzîkî 55 salan dersdarî û sey-datî kiriye. Herkes rewşa medreseyên Kurdistanê dizane, dê bizane ku di van salan de bi hizaran feqe di ber destê wî de borîne. Vêca yê kitêbek xwendî yan jî zêdetir xwendî. Ji ber hindê em dişên bêjin bi sedan peyrewên wî hene. Ji xwe ew hem mela û muderris bû, hem jî şêx û mutesewwif bû. Mensûb

û murîdên wî jî gelek bûn. Lê ji ber tewazû' û dîl-nizmiyê icaze zû bi zû nedida herkesê teleb jê kirî. Ji bo icaza 'ilmî feqiyên xwe rê dikirin dev dostên xwe wekî Mela Burhan û Mela Bedreddîn û gelek melayên ji xwe çêtir diditin. Bes icaza 'ilmî jî ya terîqetê jî daye birayê xwe Mela Muhemmed Nûrî yê Berwarî. Ji bilî wî kurê wî Şêx Muhemmed Wefa jî niha postnişînê wî ye û li cihê wî dersê dide.

ÇÎROK Û SERHATİYÊN WÎ

JÊDER Û ÇAVKANI-YÊN VÊ KITÊBÊ

Ji bo berhevkirina van zanînan li dor jiyan û berhemên Şêx Muşerref, me mifa ji çend jêderekan wergirtiye. Lê berî wan jêderên nivîskî, me mifayekî mezin ji çavkaniyên zindî wergirtiye. Ew jî ev in; Profesor Îhsan Sureyya Sirma, Şêx Hemdullahê Xunokî, Mela Bedreddînê Tilloyî, Şêx Muhemmed Wefa, Şêx Muhemmed Şîfa, Mela Burhanê Tilloyî, Mela Necmeddînê Nîvilî, Mela Se'îdê Muezzin û gelek dost û nasên din. Em supaskarê wan in û Xwedê ji hemîyan razî be...

Ji bilî van çavkaniyên zindî û bi şifahî gelek tişt bo me gotin, jêderên me yên dî jî ev in;

1- Şî'rên Şêx Muşerrefî bi xwe, ku gelek dîrok û zanîn wî bi xwe qeyd kirine.


2- Kitaba Hacî Ehmed ya Şêx Muşerrefî ku zincîra îcaza wî ya terîqetê têde ye.

3- Nameya Imhat min

alsîre alzatiye lilşîx wal'alim alrebbanî Mûhemmed Bedreddîn al-tilowî al-fqîrî al'basî mosse alşam liltba'e.

4- Gotara "Edîbê Mezin Şêx Muşerrefê Xunokî çû rehmeta Xweda ji nivîsîna 'Ebdurrehman Cûdî, kovara Nûbihar, hejmara 104, Bihara 2008'an.

5- Ferhenga Sêrtê Evdila Botî îlona 2011'an.



HELBESTEKE ŞÊX MUŞERREF

KITÊBA GÛZ Ê MEWÎJ

Gelî feqiyan gelî feqiyan nezer kin
Heçî bêjim bizanin hem ji ber kin

Çiku ez bo we tehqîqa evîn im
Muhîbbek sadiq im hem xemrevîn im

Kelamê min xweş û pir nazdar e
Şîrîn e taze ye wek nûbihar e

Ji bo qet'a xirabî şîrê tîj e
Wekî navê xwe ye gûz û mewîje

Fesla tehsîlê;

Bixunin hûn nekin teqîsîr û sistî
Emanet se'î û tehsîl û duristî

Duristî lefzekî kurt û dirêj e
Kesê ku ew durist nabî qirêj e

Bixunin hûn di havîn û zivistan
Nebî çê bî ji we yek rojê westan

Kesê xwenda muheqqeq her emir e
Nexwenda her wekî pîvaz û sîr e

Bi diqqet hûn bikin daim mitale
Mitale malekî qet bê zewal e

Ji metnan qet nebî lefzek ji bîr kin
Xwe destvala û bêmal û feqîr kin

Nivîsandin qe nahêlî ku xwenda
Ji ,ilmê xwe bikit yek lefzê winda

Ji ,ilmî ra qelem laşekke nîv e
Ji bona her kesê xet zêr û zîv e

Fesla qedrê seyda;

Ji bo seyda muheqqeq ferze ikram
Kesê ku nake ikram naxwe in'am

Ji seyda ger dixwazî istifade
Divêtin tu bikî bo inqiyade

Ji seyda ra kesê nakit ita'e
Qe nabîni di dunya intifa'e

Eger jê ra mutî' nabî bizane
Ku seydayê te ew nefsa nezan e

Ji bo wî zahir û batin evîn be
Kesê ku ew nevê jê ra nevîn be

Îmamê me 'Elî dibêjî: Efendim
Li her 'erdî ji bo ustadî 'ebd im

Yekî got: ey Îskender bo çi daim
Dikî teqdîm li ser babê xwe ,alim

Cewab da; faida babê fena ye
Welakin faida 'alim beqa ye

Fesla mu'ameleta hevalan;

Bi hevra xweş biborînin bi şahî
Bixwûnin hûn bi meqsûda îlahî

Bi hurmet bin ji bona hev dewamî
Hemî pêk ra ji hev ra kin xulamî

Emanet sed emanet sed emanet
Ji bona hev bikin daim siyanet

Xusûsa yê ku lefzek zêde xwendî
Hemî hev ra ji bo bêjin: efendî

Hemî hûn 'eskerê xasê îlah in
Xulam û xadimê wî bargah in

Eger ku hûn ji bona hev nebaş bin
Ji dergeh dê li paş bin bê me'aş bin

Nebî carek di dunyayê ku şer kin
Heta sax in fihêtkar û zerer kin

Nebêjin: ratiba min zêde dûr e
Weya ev xizmeta hanê bi zor e

Nikarim ez hero hucrê bimalim
Li mala xwe ,ezîz û hem delal im

Kubar im min ji şalê xwe fihêt e
Binêre îşlikê min şubhî pêt e

Fesla exlaq;

Nebî çavê we daim bî li kevçik
Weya şalê heşîn û ya ne pirçik

Cil û pirçik ji exlaqê jina ne
Biha nakit kesê metnê wî nan e

Ji bo feqiyan civat û hem 'elaiq
Di gel xeyrî feqan qet nîn e laiq

Di nava gund herin meşyek giranî
Li rast û çep nezer 'eyb e tu zanî

Muheqqeq pir kenîn û deng bilindî
Munafî ne ji bona ,eqlemendî

Cihan paqij bikin çendî bikarin
Di hucran qirş û qal wek 'eyb û 'ar in

Xatime;

Îlahî tu min û feqiyan îlahî
Himayet kî ji ef'alê menahî

Me şêrîn kî bi wan ewsafê şêrîn
Gelek muhtac û ne'lac û feqîrîn

Ji wê behra ku jê rihtî bi qencan
Bike ihsan ji bo me yek du fincan

Selat û hem selam hingî hurûfan
Li pêxember di gel sehb û mirovan

Ji ‘Îşqa Faniyê Destan Bikêşe

Tehsîn İbrahim Doskî

li ‘esmanê te reş ‘ewr in ne sahî
ji baxî çû bihar û keyf û şahî
dema roja te ava bit şevê bêt
tu sehke ha eve hat wê berahî

befir barî ser û rîha spî kir
erê ma ne bes e lehu û melahî?
‘umr borî hilo karî bike zû
bila bes bit te sistî û tenahî

heval çûn keftine bax û beheştan
li vêrê hêj bi nalîn û bi ahî
ji ‘îşqa faniyê destan bikêşe
bike lavê li dergahê îlahî

tu dê çî rûs û riswa muflis û jar
du dest vala ji xêrê pir gunahî
cewabê dê çewa dey dê çî bêjî
xudanê deftera reş pir menahî

bi rehma xwe eger navî neînî
li dîwan û huzûrê rûsiyahî
bîza’et te welew muzcate î dil
belê dê key tu qesta baregahî

çi hewcey zadiye bo wî kesê ku
diket qesta cenabê padîşahî
li ser sifrê bi rehmê min vexwîne
feqîrim ez tu sultanî tu şahî

‘Ebdirehmanê Kurê ‘Ewf

Seyfeddin AYKAÇ



‘Ebdirehmanê kurê ‘Ewf, ji mezinên sahaban bû. Dema ku wefat kir û cinazê wî birin, hz. Se’d ê kurê Waqqas jê re wiha gotibû: “Çiyayê bilind” bi rastî jî li aliyê îman û misil-mantiya xwe de mîna çiya bû, tu bager û bahozên kufrê û nîfaqê di temenê wî de ew nehejandibû.

Deh sal piştî bûyera Fîlê hate dinyayê. Di wextê cahiliyê de navê wî: ‘Ebdul’emr bû. Resulullah ‘aleyhîselam navê wî guhert û kir ‘Ebdullah. Hêj Resulullah ‘aleyhîselam neçûbû mala Erkam bû misilman. Ji muhacirên pêşîn bû. Koçî Hebeşistanê kir, piştî jî koçî Medîne kir. Li Medîne dema biratî hate avakirin, ew û Se’dê kurê Rebî’ bûne destebirakên hev.¹

Di Herba Bedrê, ya Uhudê û yê din de bi Resûlullah ‘aleyhîselam re bû. Di herba Uhudê de ji yanzdeh cihên xwe hatibû birîndarkirin. Ji wan derban yek jî li piyê wî ketibû û bi wê derbê kulek mabû. Ji wan kesên ku bi bihuştê hatine mizgînîkirin, yek ji wan bû. Di derheqê wan de ev hedîsa hanê ku hz. Se’îd kurê Zeyd gotiye hatiye riwayetkirin: “Min ji Resûlullah ‘aleyhîselam wiha bihîst: ‘Deh kes ji ehlê bihuştê ne; Ebûbekir di bihuştê de ye, ‘Umer di bihuştê de ye, ‘Elî, ‘Usman, Zubeyr, Telha, ‘Ebdirehmanê kurê ‘Ewf, Ebû ‘Ubeydullahê kurê Cerah, Se’dê kurê Ebûwaqqas û Se’îdê kurê Zeyd di bihuştê de ne.”²

me’rifetî Sahabe, c.3.495

²Tirmizî, Sunen, c.5, r.333, Ehmed b. Hembel, Musned, c.1, r. 193.

Dema Se’dê kurê Rebî’ û hz. ‘Ebdirehman bûne destebirakên hev, Se’d ji hz. ‘Ebdirehman re wiha got: “Gelek malê min heye. Ez dixwazim nîvî vî malî bidim te û du heb jinê min jî hene, li herduyan binhêre ka tu kîjanî dipejirînî, ez ê wê berdim û dema ‘iddetê wê temam bû ji xwe re mar bike.” Hz. ‘Ebdirehman ji ber teklîfa wî ya camêrî ev bersiva hanê da: “Cenabê Xwedê bila malê te û malîyên te bimbarekî te bike. Xwedê ji bo wê tevgera te xêra te bide. Ya baş û delal ev e ku tu ji min re riya sûkê bidî nîşan, ev besî min e.”³

Hz. ‘Ebdirehman k. ‘Ewf (r.x.l) ji bo ku di nava Qureyşiyên ku karê ticaretê baş dizanin de mezin bibû, hema tu

¹Ibnul Esîr el-Cezerî, Ūsdûl Xabe Fî

³Nesai, Sunena Nesai, c.6, r.137.

bêje pisporê wî karî bû. Di sûka Medîne de dest bi karê ticaretê kir û Xwedê serweteke mezin dayê. Dema behsa ticaret û dewlemendiya wî dihate kirin wiha dîgo: “Xwedê Te’ala nîmeteke wisa mezin dabû min, hema min kevirek jî ji ‘erdê rakira dibû zêr.”

Hiz. ‘Ebdirehman kurê ‘Ewf (r.x.l) di dema Resûlullah ‘eleyhîselam de çiqas herb hebû beşdarî teva jî bibû. Rojekê di riya sefera Tebûkê de eshabî li cihekî sekinîn û bêhna xwe vedan. Wextê nimêjê, Resûlullah ‘eleyhîselam çû destnimêjê û hinekî dereng ma. Sahabeyan jî bo nimêjê zû kirin û hiz. ‘Ebdirehman dane pêş. Dema Resûlullah ‘eleyhîselam jî destnimêjê hat hiz. ‘Ebdirehman dît ku Resûlullah ‘eleyhîselam tê. Niyet kir ku xwe bide paş lê Resûlullah ‘eleyhîselam destûr neda û çû pişt ‘Ebdirehman, nava sefa cema’etê de cihê xwe girt.⁴ Heta wê rojê tu kesî li pêşiya Resûlullah ‘eleyhîselam nimêj nekiribû, ev bi tenê nesîbî hiz. ‘Ebdirehman bibû. Cara duyem jî wextê nêzîkbûna wefata Resûlullah ‘eleyhîselam hiz. Ebubekîr (r.x.l) îmamî kiribû.

Di nava sahabeyên Resûlullah ‘eleyhîselam de bi tenê Resûlullah ‘eleyhîselam lixwekirina destûra hevrişimê dabû hiz. ‘Ebdirehman (r.x.l.).

Rojekê di navbera hiz. Xalidê kurê Welîd û hiz. ‘Ebdirehman de gengeşiyek çêbû. Hiz. Xalid jî hiz. ‘Ebdirehman re wiha got: “Tu bi rojên derbasbûyî mezinatîyê li ser me dikî.” Dema ev gotin gihîştê Resûlullah ‘eleyhîselam, Resûlullah ‘eleyhîselam wiha got: “Dev ji hevalên min berdin. Ez sond dixwim bi Wî kesî ku nefsa min di destê Wî de ye, yek ji we di riya Xwedê de wekî çiyayê Uhudê zêr belav bike, ev xêra wî nabe mîna kulmek yan nîv kulmeke yekî ji wan.”⁵

Hiz. ‘Ebdirehman di riya Xwedê de her daîm întîfaq dîkir. Rojekê sî heb kole azad kir.⁶ Rojekî piştî wefata Resûlullah ‘eleyhîselam di Medîne de karwaneke ticaretê ya mezin hatibû û kelecaniyek ketibû nava millet û çûbûne pêşiya karwên, dema hiz. ‘Aîşe pîrsa wê qelebalixê kir jê re gotin, karwana hiz. ‘Ebdirehman e. Hiz. ‘Aîşe wiha got: “Resûlullah ‘eleyhîselam di derheqê ‘Ebdirehman de wiha gotibû; “Min ‘Ebdirehman dît ku çalepîka

diçû cennetê.” Dema hiz. ‘Ebdirehman ew mizgîniya hanê bihîst, hema di cî de ew karwan hemî bi hêştir û malên li ser wan, hemî di rêya Xwedê de belav kir. Ew kesên ku riwayet dîkin, dibêjin ku ew karwan hêfsed hêştir bûye û malên ser hêştiran, jî hêştiran bi qiymetir bûye.⁷

Hiz. ‘Ebdirehman bi merdbûna xwe û bi xêrxwaziya xwe meşhûr bû. Xwedê çiqas didayê wî jî di rêya Xwedê de ewqas dida û belav dîkir. Wî çiqas dida Xwedê jî qat bi qat dida wî. Piştî ku Resûlullah ‘eleyhîselam wefat kir, ‘erdekî wî yê bi qiymet hebû, bi çil hezar dînanan fîrot û di rêya Xwedê de li xanimên Resûlullah ‘eleyhîselam parve kir. Dema ku para hiz. ‘Aîşe (r.x.l) birin danê û jê re gotin hiz. ‘Ebdirehman şandiye, hiz. ‘Aîşe wiha got: “Resûlullah ‘eleyhîselam ‘piştî min ‘ebdên Xwedê yên ku ehlê sebrê ne wê ji we re bi şefqet bin.” Gotibû. Ellah, ‘Ebdirehmanê kurê ‘Ewf bi ava çemên bihuştê têr bike.”

Hiz. ‘Ebdirehman di wextê hiz. ‘Umer de di şûraya dewletê de bû. Ango jî bo îslahata gel çî di derheqa gerîndeya dewletê de çî ji bo fetwayeke şerî’etê be, ew biryara wan kesan dibû hikim jî bo dewlet û gel.

Dema li ser nimêjê xençer li hiz. ‘Umer (r.x.l) xistin û ew birîndar kirin, nimêja ku nivî ma hiz. ‘Ebdirehman temam kir.

Ji bo hîlbijartina Xelîfetiye hiz. ‘Umer (r.x.l) şeş kes hîlbijart. Ji wan kesan yek jî hiz. ‘Ebdirehman bû û hiz. ‘Ebdirehman kir mezinê wan. Dema hiz. ‘Umer wefat kir. Hemî çûn ketin malekî û hiz. ‘Ebdirehman pêşiya hemiyan got; “Ez xelîfetiye naxwazim, bi rîza xwe dev ji wî heqê xwe berdim.”

Di dewra hiz. ‘Usman de êdî hiz. ‘Ebdirehman kal bibû. Dev ji her tiştî berdabû. Piştî çend salan, di heftê û pênc saliya xwe de 31’ê Hîcretê, li Medîne wefat kir. Cinazê wî hiz. ‘Usman rakir û dema ku birin aliyê qebiran ve hiz. ‘Elî wiha got: “Ey kurê ‘Ewf bi xêr û xweşî here jiyana bêdawî. Te di wê jiyana fanî de rojên herî xweş dît û hêj ev jiyana delal şêlûnebûyî tu çûyî axretê.”⁸

Xwedê rehma xwe lê ke û me bide xatirê wî.

4İbnul Esîr el-Cezerî, Üsdül Xabe Fî me’rifetî Sahabe, c.3, 499

5İmam Buxarî, Sehihi Buxarî, c.5, r.10, İmam Muslim, Sehihul Muslim, c.7, r.188.

6İbnul Esîr el-Cezerî, Üsdül Xabe Fî me’rifetî Sahabe, c.3, r.496

7Muhammed Yusuf Qandehlevî, Heyatus-Sehabe, c.2, r.217.

8İbnul Esîr el-Cezerî, Üsdül Xabe Fî me’rifetî Sahabe, c.3, r.497-8

HELBESTA “EŞQA WELAT” A EVDIRREHÎM ZAPSÛ

A. Aqîl Mihacir

Ev helbest, ji aliyê Evdirrehîm Zapsû ve li Rûsyayê hatiye nivîsîn. Evdirrehîm Zapsû, ronakbîr û mêjûvanekî Kurd e.

Ev kes, hevalê Bedî’uzzaman e. Herduyan di Şerê Cîhanê yê Yekem de, li hember Îris şer kirin; dû re jî dîl ketin. Bi awayê dîlane tev li Rûsyayê mane. Ew bûyera ku Ustad li hember serokleşkerê Rûsyayê ranebûye ser piyan, cara yekem ji aliyê Zapsû ve hatiye eşkerekirin. Ev bîranîna cara ‘ewil, di kovara Ehl-i Sunnetê de, ji aliyê vî ronakbîrî ve hatiye nivîsandin. Bi xêra vê nivîsê ve Telebeyên Rîsaleyên

Nûrê pê hesiyane ku tişteki wisa bi serê Ustêd de hatiye. Dû re ev bûyer, di nava Xwendekarên Rîsaleyan de belav bûye.

Han, Evdirrehîm Zapsû, di wê dîltiyê de li ser hesreta welêt helbestek jî nivîsandiye. Ew helbest di kitêba Mûsa Anter de (Hatîralarim) cî digre.

Bi zimanê xwe yî orjînal ew helbest ev e:



EŞQA WELAT / WELÊT

Bihar hatin şîn bûn giya
Cil berkirin xemlîn çiya
Geştan bikin ser kaniya
Ji xêzê diçit şîbhê ziya
Berraq û pak û safiya

Eşqa welat! Eşqa welat!

Te cerg û mêlakê me pat

Carek din min dîba xwezî

Konê di reş, kiriyêt pezî

Tomast li ser avêt tezî

Zeriyêt wek sirmê kezî
L' bêrî' l pê biznan dibezî

Eşqa welat! Eşqa welat!
Te cerg û mêlakê me pat

Bo çi ji te em bûn cuda
Me terk kirin lezzet û sefa
Şahan kuçe dane geda
Hatin li bin xaniyê me da
Terka te kir bona Xweda

Eşqa welat! Eşqa welat!
Te cerg û mêlakê me pat

Kanî welatê serhedan
Sotim ewan ateşgedan
Lewra ku gur bûne şivan
Dengê bilûran naliyan
Dengê hawaran gaziyan

Eşqa welat! Eşqa welat!
Te cerg û mêlakê me pat

Dengek tune şolek ecîb
Em mane sergerdan xerib
Dûr bûn welatê dîlîrîb

Carek dî, dê bite nesîb
Çûna li wî rebbê mûcîb

Eşqa welat! Eşqa welat!
Te cerg û mêlakê me pat

Dibêjin welat bo dijmin e
Ez sax bim qe mumkin e?
Xîret hamiyet zamîn e
Eşqa wî mêhvanê min e
Qurban ji wî ra mergê min e.

Eşqa welat! Eşqa welat!
Te cerg û mêlakê me pat



Min Gelek Bêriya Te Kiriye

(Li ser bîranîna seydayê hêja Abdulcelil Candan)

Abdulhadi TIMURTAŞ

Berî niha tam bi salekê, weke îro tu ji me veqetiyayî û çûyî. Belê ji hingê ve, rojek an saetek jî be tu ji bîra min neçûyî. Ez ê rastiyeke bêjim dibe ku neyê bawer kirin, kêşev hene ku ez te di xewna xwe de nebînim. Zehf caran nikarim tu me'neyan li hinek xewnan bidim. Di piraniyên xewnên xwe de di bîra wefata te de me, belê cardî jî te weke saxan dibînim.

Carekê min dît ku em li mala we ne, baweriya min bi wefata we hebû. Vêca tu ji oda xwe derketî. Te digot: “Kitêbên min ji min dûr in û te îşareta bal du pirtukxaneyan ve dikir; wan bîne li ber derê oda min bi cih bike. Min dida xwe ku ez wan herduyan bînim. Belê min hew didît ku wê herdu pirtûkxane li cihê te îşaretkirî ne! Belê min nezanî ka gelo bi çî awayî û kê ew anîn li dera te îşaret kirî bi cih kirin. Dixwazim diyar bikim ku kitêbên te weke ku te hiştin bi eynî rewşê weke ku te wesiyet kirin di cihê xwe de ne.

Roja ku te bang li min kir û ez hatim min tu birî nexweşxaneyê, te xatir ji maliyên xwe xwestibûn û wesiyetên xwe jî ji wan re kiribûn. Belê di sohbeta min û te de tu îşaretên veqetandinê tunebûn. Xeberdana te bi min re weke ku em ê hê temenek dirêj bi hev re bin bû. Piştî wefata te min gelek caran ji xwe pirsî; ‘çima xatir ji min jî nexwest û ez hiştim ber derî û çû?’ Belê, min pişt re fêhm kir. Lewra em ê piştî mirinê jî her wext bi hev re bûna, çî şiyar û çî di xew de, lewra te zanibû ku tu yê her tim di bîra

min de bi û ez tu carî te ji bîr nakim.

Berî niha bi du mehan hatim Goristana Girê Savarê û li ser gora te sekinîm. Tenê bûm, roj jî roja îne bû. Ji nîv saetê zêdetir li ber kêla serê te mam. Belê baweriyek bi hêz ji min re çêbû ku tu ne li wir bûyî. Bo vê yekê ji bilî hêstirên ku herdu lemkên min germ dikirin bi tu tiştî nehesiyabûm. Belê dema bedena min bi gavên giran giran ez ji goristanê derxistim û ez gihandime kolan û taxên nava Batmanê, min tu li serê her kolanê didîtî, carna jî weke ku em herdu bi hev re dimeşyan û berê me li nimêja îne be ku wext jî nêzîk bû. Min berê xwe da wê mizgefta ku te cara dawî berî wefatê bi hefteyekê li Batmanê têde xutbe xwendî û te bi vê wesîlê xatir ji Batmaniyan xwestin. Wîlo ji min re dihat ku yê li ser minberê tu yî, ne Mele Mûsa ye.

Rojekê piştî wefata te bi zemanek dirêj di oda te ya kitêban de bûm, di nav kitêban de li kitêbeke ku ji min re lazim bû digeriyam. Belê çiqas geriyam jî min nedît. Zanibûm tu ne li mal î, lê cardî jî weke her car bêfîkr û bê tesewura cuda bûna te ji me, min berê xwe da telefona xwe û min rahiştê ku li te bigerim û cihê wê ji te bipirsim. Lê mixabin telefon ji destê min ket...

Digel ku ji bilî xewnên şevan, zehf caran weke bi şiyarî te dibînim, lê bele ew nesîmê bêhnên beriyê ku di rojên t'ezîyê de li min dida û derbas dibû diçû, dilgeşiyek gelek zêde ji min re çêdikir

êdî hew his dikim. Hikmeta vê mehrûmîyetê min hêj fêhm nekiriye. Tiştin din jî hene nikarim bejim lewra tênagihim û dibe ku newime fêhmê.

Dibe ku ev rewş jî gelek mirovan re tiştek ne'edetî were dîtîn, dibe ku hinek min weke

were zanîn ku Seyda di jiyana xwe de dibû sedema heyatek ebedî bo gelek kesan û zehf caran ew bi xwe dibû jiyan jî hinek miriyên ser lingan re wê demê ez ê mezûr werim zanîn. Tişteke dîtir jî heye; ma gelo mirov dikare maziya xwe jî bîr bike? Ma gelo tiştên di hişê min de wiha bi cih bûne yek di-



mubtelayê nexweşiyê jî bibînin. Belkî jî hinek ji ber vê rewşê 'itaban li min bikin. Lewra li gorî bawerîya wan lazime yek hêdî hêdî miriyên xwe jî bîr bike û wan di nîsyanê de winda bike. Lê ez wilo bawerim ku wan 'eleqe û pêwendiyên min û Seyda bi hev re bizanibûna yek jî van miqaman nedifikirîn. Bi kurtayî ev şazdeh sal bûn ku rojeke me ya hevdu nedîtî an jî bi telefonê bi hev re neştexilîn tunebûye. Ji bo vê yekê ez bi vê rewşê xweşhal im. Bêguman heke ku demekê sistiyek bikeve vê rewşa min ez hingê bêhteng dibim û دنیا li min teng û tarî dibe.

Hinek hene bi mirina xwe dibine sedema jiyanek ebedî bo hinek mirovan, û hinek hene bi mirina xwe dibine jiyan bo hinekên dîtir. Heke ku

kare ku singerekê ser re bibe û weke agahiyên li ser rûpelekî nivîsî wan rake û pela hişê xwe spî bike? Belkî hinek mirovên vê daxwaziyê dikin hebin, lêbelê ez ne ji wan im.

Ez hê jî zehf caran şewra xwe bi te dikim weke ku tu sax bî! Çi bikim di valehiyeke bême'ne de me. Tu caran te jî bîr nakim. Min gelek bîriya te kiriye. Tu di bihişta xwe de tim xweşhal û dilgeş be.

08. 10. 2013. Wan.

DI KURDÎ Û ÎNGILÎZÎ DE HIN BÊJEYÊN NÊZFORM Û NÊZWATE

Ahmet DEMİR

DESTPÊK

Kurdî, bi dengnasiya xwe, bi hevoksaziya xwe û bi bêjeyên xwe ve, zimanekî serbixwe ye. Ji gelek zaravayan pêk tê ev ziman. Bi taybetmendiyên xwe yên rêzmanî ve dîyalektên vî zimanî jî gelek dewlemend in.

Bi hemû zaravayên xwe ve Kurdî, endamê *Malbata Zimanê Hind-Ewropayê* ye; li vir jî beşa *Hîndê*, li Hîndê jî ji beşa *Îranê* ye. Yanê Kurdî, di nav malbata mezin de merivê Îngilîzî, Almanî û Fransîzî û hwd. e; di malbata Hîndê de, merivê Hindî, Sihî û Urdî û Benglaşî û hwd. e; di malbata Îranê de, merivê Farisî, Osetî, Peştûyî û Tacîkî hwd. e.

Hat gotin ku zimanê Kurdî, xwedî gelek zarava ye; belê zaravayên sereke yê vî zimanî ev in: Kurmancî, Kirmanckî/Dimilî (/Goranî/Hewramî?), Soranî/Babanî, Kelxûrî, Lorî û Belûcî. Her zaravayê vî zimanî xwedî taybetmendiyên xwerû ne. Bi hemû dîyalektên xwe ve zimanê Kurdî, endamêkî taybet yê *Malbata Zimanê Hind-Ewropayê*, yê dewlemend e.

Ev tespîta endambûna vê malbatê ya Kurdî, xwe bi gelek sparteyan îspat kiriye. Ji aliyê tewandina nav, cînav û lêker, rengdêr û hwd. ve, ji aliyê qertafgirtinê ve, ji aliyê dengnasiyê ve, ji aliyê hevoksaziyê ve û ji aliyê hevparbûna gelek bêjeyan ve, ev nêzîkahî û endametî li ber çavan e.

Di rastiyê de, ev her yek taybetmendî, bi serê xwe hêjayî vekolîniyê ye û bi rastî jî pê pêdivî heye. Lê mixabin di vê vekolînê de em dê bes li ser di Kurdî û Îngilîzî de nêzform û nêzwatebûna hin bêjeyan bisekinin.

Di vê xebatê de me bêje sinifandin, û li gor beşên wan me ewna par ve kirin. Di beşa ewil de, me lêkerên ku di navbera Kurdî û Îngilîzî de hevpar in, peyitandin. Di beşa duyem de em li ser rengdêrên hevpar sekinin. Di beşa sêyem de me hin jmarên Kurdî û Îngilîzî dan ber hev. Me di beşên din de vekolîn û tespît li ser navên mehan, endamên malê, endamên bedenê, navên bi bedenê re têkildar, navên bi sewalan re têkildar, navên zemîn/erdnîgarî, navên şênber û razber û navên cînavan, kir. De kerem kin em tev lê binihêrin:

LÊKER

Anin (Dij: Birin)	Bring
Barîn /baran	Rain
Bû	Be
Bûyîn	Beîng
Cûyîn	Chew
Çimt	Jumb
Çirîn	Tear
Çûyîn	Going
Dî (ji dîtînê)	See
Dor	Tour
Firîn	Flying
Gezkirin	Gnaw
Gir (bûn)	Grow
Grî	Cry


Ĥop/holkirin	Hop	Ken / kêf	Cheer
Huř bûn	Hush	Kîp	Keep
Kal (kalîn)	Call	Kurt	Curt
Kan (kanîn)	Can	Kurt / kin	Short
Karkirin	Work	Mê	Maid
Leqleq(kirin)	Lark(ing)	Mêr	Man
Mayîn	Remain	Mestir	Master
Mirin	Mortem	Mirî / mirde	Mortal
Mirindayîn / kuřtin	Murder	Nêz / nîz	Nêar
Pifkirin	Puff	Pař / piřt	Back
Qut kirin	Cut	Pir	Plural
Rawestîn	Rest	Pir/pird	Bridge
řandin	Send	Rêbir	Robber
řermkirin	Bê ashamed	Qît	Kid
Xwest / west	Want	Rast (alî)	Right
Bê (ji gotinê)	Bade	Rast (ne derew)	Right
Heyîn /	Having	Rût/rûd	Nûde
Heye	Have	Tarî	Dark
		Tenik (lawaz)	Thin

RENGDÊR

Bed	Bad
Bêtir	Better
Camêr/ciwanmêr	Centilmen
Civan	Juvenile
Comerd	Generous
Dubare	Duble
Entîke	Antique
Germ	Warm
Gir / gird	Grand
Gir / gird	Great
Heftgoře	Heptagon
Jin	Gyn
Karker	Worker

JMAR

Çar	Four
Çardeh / desûçar	Fourteen
Deh / dest	Ten
Du / dudu	Two
(her) Yek	Each
Heftgoře/heftalî	Heptagon
Heftkořeşeyî	Heptagonal
Heyřt	Eight
Heyřtê / heřtay	Eighty
Neh	Nine
Sifir	Zero
Hîrê / sê	Three



Hîrê / sêzdeh	Thirteen
Nîn	None
Nod / neway	Ninety
Nozdeh / newês	Ninteen
Pênc rê	Pentatlon

NAVÊN MEHAN

Meh	Moon/Month
Avrêl	April
Mard	Marc

ENDAMÊN MALÊ

Bra	Bro
Brader	Brother
Maê/Mader	Mother
Nevî	Nephew
Duxter / dot	Daughter
Mak	Main

ENDAMÊN BEDENÊ

Brî	Brow/eyebrow
Çene / çenge	Chine
Çerm	Derm
Dev	Jaw
Didan	Teeth
Gan/giyan	Ghost
Junî	Knee
Lêv	Lip
Ling	Leg
Mêjî	Mind
Navik	Navel
Neynûk / nînok	Nail
Por	Hair

Poz

Nose

Qendîl

Candle

Robar

River

NAVÊN BI BEDENÊ RE TÊKILDAR

Belxem

Phlegm

Stêr

Star

Çepik

Clap

Dar

Tree

Êş

Ache

Dilop

Drop

Sewt

Sound

Rê

Road

Slop

Slob

NAVÊN ŞÊNBER

Teşk

Thigh

Ar / agir

Fire

Balgî

Pillow

NAVÊN PÎŞEYAN

Bijîşk

Physician

Bar

Burden

Dadger

Judge

Bazar

Bazaar

Berber

Barber / haircutter

Ber

Pro/pre/fore/front

Gewherger

Jeweller

Cihû

Jew

Hingivfiroş

Honey seller

Cil

Cloth

Derî

Door

Dolab

Cupboard

NAVÊN BI SEWALAN RE TÊKILDAR

Cûk

Cock

Gewher

Jewelry

Çîk/çêlik

Chick

Hene

Henna

Eylo

Eagle

Hera/vira/virê/êra

Here

Hesp

Hourse

Hingiv

Honey

Mîşk

Mouse/mice

Hol

Hall

Qaz

Goose

Komel

Community

Sihorîk/Simor

Squirrel

Kuder

Where

Ûezal

Gazelle

Lambe/lempe

lamp

Dêl / boç

Tail

Masûlke

Muscle

Hêk

Egg

Mirîgeh

Morg, mortuary

Mîz / mîs

Piss

Name

Mail

NAVÊN ZEMÎNNASÎ/ERDNÎGARÎ

Ba

Blow

Par

Part

Erd

Earth

Pêk

Pace

Erdhej

Earthquake

Pêlek

Pedal

Pelg/rûpel

Page

Pênc Lîstik	Pentathlon
Pênûs	Pen/pencil
Per / pel	Paper
Pûş	Push
Rê	Road
Riz	Rice
Saq (ên goran)	Socks
Sî	Suede
Sol	Shoe
Şekir	Sugar
Şorbe	Soup
Tîre / eşîr	Tribe
Vira / ev der	Here
Ėardolab	Gardirobe
Zîv	Silver

NAVÊN RAZBER

Awa	Way
Bang	Bang
Bername	Programme
Bernav	Pronaun
Civantî	Juvenility
Çawa/çowa	How
Dadmend	Judgement
Dem / Tim	Time
Demî	Tem
Destbirî	Desperate
Digel	Together
Fermî	Formal
Hêvî	Hope
Îdyom (?)	Idiom
Na	No
Nam/nav	Name

Nav	Noun
Navniçik	Nickname
Nefermî	Informal
Neherdu	Neither
Nema	Never
New / nuh / nû	New
Niha/Nuha	Now
Nûçe	News
Şerm	Shame
Şmaq/şîlmaq	Smack
Tirs	Dismay
Ėerez	Grudge

NAVÊN CÎNAVAN

Me	Me
Min	Mine
Tu	Thou/you
Xwe	Own

ENCAM

Mîna ku hate dîtîn, di Kurdî û Îngilîzî de gelek bêjeyên hevpar hene. Ev hevpariya, hew ne munhasirî çend babetan an jî bêjeyan e. Di hemû beşên bêjeyên wan zimanan de ev hevparî xwe nîşan dide. Halevku, ji hev veqetîna malbata Hînd û Îranê, pir zûda ye; ji hev veqetîna Hînd û Ewropayê, ji veqetîna Hînd û Îranê hîn zûdatir e.

Digel bi qasî vê zûdatirê, di navbera zimanên vê malbatê de gelek cuda bûn û ji hev cihêbûn çêbûne jî, di navbera Kurdî û Îngilîzî de, hîn hebûna gelek bêjeyên nêzwate û nêzform, me mecbûrî tesdîqkirina hevmalbatbûna ev herdu zimanan dike. Ez bawer im, li ser hevparbûna aliyên din jî vekolîn werinkirin, dê encameke ji vê cihêtir, dernekeve pêşberî me.

Dixuye ku gelek qadên zimanê Kurdî, li hêviya ev cûr vekolînan in. Ev vekolîn, heke bibe wesîleya xebatên nû yên li ser zimanê Kurdî, peywira xwe bi cî aniyê.

BIBE YA BAŞTIRÎN

Douglas Malloch

Ji Îngilizî: Mehmet YILDIRIMÇAKAR

Ger tu li serê çiyayekî nebî dareke çamê,

Di newalekê de bibe qirşikeke biçûk.

Lê divê tu li nav qirşikên li wir de bibî ya baştirîn.

Ger tu nebî qirşikekî, bibe qetek giya, şahiyekî li rêyekê bar bike.

Ger tu nebî kulîlkeke miskê, bibe kamirek.

Lê divê tu li nav behrê de bibî kamira jîndartirîn.

Em tev nikarin bibine sertîm, bivê nevê em bêgav in ku bibine pêvenişt.

Li dinê de ji bo me hemiyan tiştek heye.

Karên biçûk û yên mezin li benda me ne.

Ew karê ku tu dê bikî, ew e ku, bêtirîn nêzî te ye.

Ger tu nebî kolan bibe şiverêyek.

Ger tu nebî roj bibe stêrkek.

Qezenc kirin û têkçûn ne bi pîvanê ye

Ger tu çi bî divê tu bibî ya baştirîn.

PÎVANÊN JIYANÊ

Ömer ÜMÎT

HEBÛN û NEBÛN

Xuyanebûn, ne delîlê nebûnê ye. Wisa jî, nehatzanîn ne delîlê nebûnê û nînbûnê ye.

AXAFTIN

Çawa ku bêdengbûn, nayê wateya ku tu, ti tiştî nizanî; wisa jî, piraxaftin, nayê wateya ku tu gelek tiştan dizanî.

Heke dem nehat neseqînî tu meaxive! Heke dem hat sekinî jî mesekine biaxive!

Di dema neaxaftinê de axaftin û di dema axaftinê de neaxaftin, bi gotina herî nerm ve bêhişî ye.

Dema ku tu axifî tiştên ku tu dizanî bibêje, yên ku tu tam nizanî mebêje!

Tiştên ku ji aliyê kesan ve hatin gotin baş guhadrî bike! Lê hemûyan rast mehesebîne!

DILNIZMÎ

Kî dibe bila bibe tu, ti kesî biçûk mebine;

Muxatabê te kî dibe bila bibe, tu xwe mezin mebine!

KESÊN NEDURUST

Kesên nedurust, xwe ji rastiya xwe cihê nîşan didin. Ev helwest çiqas îbretamîz in:

Yên ku *lawaz* in xwe *qurre* dikin! Yên ku *tengaz* in *fortan* didin xwe! Yên ku di *zivarî* û *durutiye* de ne, di kirinên xwe de *ne ji dil* in.

CURHET

Curheta ku ji êqîl tê, bi rastî curhet e; lê ku ji nezaniyê tê tevhev bêhişî ye.

Curhet ji îmanê ye, yanê hêza xwe ji îmanê distîne ye. Ustêd çî xweş gotiye: “Yê/a ku îmana rastîn bi dest bixwe, dikane li hember gerdûnê bisekine!”

LEHENG

Tenê bende/kole li hêviya filitandina xwe distekin! Leheng, têdikoşin û temenê xwe di riya filitandina bendeyan de xercê dikin.

FÊRBÛYÎN

Mirov, biqasî fêrbûyîna xwe cîhanê dinase û lê hezdike: Hemû diyariyên wê, hemû fêkiyên wê û hemû peyamên wê nasdike û lê hezdike.

Yên zana li fêrbûnê hezdikin; yên nezan li fêrkirinê hezdikin.

Hewcî ku tuyê ji tarîtiyê bixeyîdî, rabe çirayekê vêxe û tarîtiyê biqewitîne!

Jiyana we, ber bi aliyekî xirab an jî nepenî ve diçe, zêde metirsîn! Hûn fêrî ajotinê bûne û dîreksiyona jiyana we di destê we de ye, ber bi aliyê rast û baş ve bizivînin!

RÛYÊ RAST

Di pêvajoya jiyane de mirov her dem nikane rûyê mirov yê rast bibîne; hew di kûlvarên jiyane yên girîng de rûyê wan ê rast xuya dibe.

XWENDIN

Heke tu dikanî bixwînî, rûyê her hebûnî tije nivîsên bi peyam in; paşda mehêlê, hima bala xwe bide ser yekî û dest bi xwendinê bike. Tuyê bibînî ku wê nivîsê bi destê te girt û tu birî gerdûneke rengîn û bi mizgîn.

ARAMA CIVATÊ Û ZAGON

Her çiqas, têkiliya arama civatê bi kesên durust û berpirs ve girêdayî ye jî, naveroka zagonên ku tevgera jiyanê dihûnin, rasterast li ser jiyanê bandordar in. Ji bo vê yekê jî aliyê rêvebiran ve çêkirin û pêkanîna zagonên li cî û xweş, civatê jî xweş bi rê ve dibe. Çêkirin û di nava civatê de pêkanîna zagonên xirab, li ser wê civatê zilmeke mezin e.

ASTÊN MÊJÎ

Gotineke navdar e: “Mêjîyên biçûk mirovan, yên orte bûyeran, yên mezin jî ramanan diaxifin.”

MIROVAHÎ

Mirovahî ji dadmendiyê girîngtir û pêşdatir e. Heya ku tu nebî mirov tu nikanî bibî dadmend.

SERKEFTIN

Heke te, ji binkeftinê xwe şîret standine, di rastiyê de tu serkeftî.

Wendakirin, heke di riya serkeftinê de ye, hew rawestgehek e.

PARÇEYÊN PIRSGIRÊKAN

Ev tespîteke gelek li cih e: Di riya çareseriyê de kê ku peywirek nekiriye stuyê xwe, bizanibe ku mezin an piçûk ew dê di pêşerojê de bibe parçeyekî pirsgirêkê.

PEYDAKIRINA DOSTAN

Heke tu li hêviya hinekan bisekinî ku wana werin te bibînin û qîmeta te fêm bikin tuyê bi salan bipêyî; na heke tu bi xwe li dostan bigerî, bawer bike ku tuyê di hundir mehekê-du mehan de gelek dostan peyda bikî...



XAWÊN

Hemû fikirîn, hemû gotin û hemû kirin, divê di riya gihîştina qada xawênê de û di ya qayîlbûna Afrandêr de be.

BAQIL

Meriv helbet ji hinekên din agahiyan bi dest dixe; lê, meriv hew bi aqilê xwe baqil dibe.

Baqil ew e ku, digel ji hevalên xwe, dikane ji neyarên xwe jî êqil bistîne.

ARMANC

Armanca hizirînê, armanca vegotinê, armanca pêkanînê, armanca têkoşînê, hemû bi hev re armanca jiyanê, divê hew xawên û razîbûna Xwedê be.

Di jiyan û jiyînê de hin armanc henin, ewqas pîroz in ku, li gor min, di riya wan armancan de wendakirin jî serkeftineke serbixwe ye.

NEHEQÎ

Li gor me çi tespîteke li cî ye: Neheqî kirin, ji neheqî dîtînê bi êştir e.

Ji Herêma Semsûrê Ji Gundê Hewêdî (Suvarlı) Çend Gotinên Pêşîyan

Mesut Kızmaz

❖ **Nayê mala min, nizane bi halê min:** Carcaran em bi rehetî li gora rewşa xuya, hinek însanan rexne dikin lê pir caran mirov di van rexneyan de dixelîte. Lewra li gel sebebên xuya, gelek jî sebebên nexuya hene. Ji ber ku mirov wan sebebên nexuya nizane, pir caran di rexneyên xwe de dixelîte. Di rewşên wiha de kesên ku rastî rexneyên neheq tên, vê gotina pêşîyan bi kar tînin û dixwazin bêjin: “Ji ber ku tu nayê mala min tu rewşa min bi temamî nizanî. Tu van rexneyên xwe li gorî rewşa li ber çavan dikî. Lê gelek tişt hene ku ne li ber çavan in. Gava tu wan bizanibî tu wisa nafikirî.” Di Tirkî de di miqabîlê vê gotinê de “Dışı seni yakar içi beni” tê bikaranîn.

❖ **Berê xwîşkan berve biran e, berê biran berve çîyan e:** Di nava malbatê de her kes bi derd û elemên malbatê re bi êş û problemên malbatê re qasî hev eleqeder nabin. Li gorî vê gotina pêşîyan qîz jî lawan bêhtir bi êşên malbata xwe re bi problemên birayên xwe re eleqeder in. Lê li hember vê yekê law gelekî xemsar in. Em nikarin bêjin her tim wisa ye lê ev biwêj jî ji ber xwe derneketîye û rastîyeke civakê nişan dide.

❖ **Bizinek di eyarê xwe de geh zeîf dibe geh bi taw (qelew):** Rewşa însanan ya aborî ji çêbûnê heta mirinê, ne wekhev e. Her tim diguhere. Carna baş dibe carna xerab. Yanî rewşa insnan ya aborî pir zû diguhere. Merivekî dewlemend û bazirgan dibe ku îflas bike û hemî waryata xwe winda bike. Însanekî xizan jî piştî xebateke dûr û dirêj dibe ku dewlemend bibe. Carna rewşa mirovan di nava mehekê an jî salekê de diguhere. Ev gotina pêşîyan ji bo balkişandina vê rewşê tê şixulandin. Yanî eyarê biznê tim ‘eynî ye lê bizin carna bi taw dibe (qelew dibe) carna jî zeîf.



❖ **Ma ê sîran hilke pîvazan biçîne:**

Min ev gotin tenê carekê ji dîya xwe bihîst. Dîya min behsa gotinên însanekî kir û got min bihîst ku filan kesî di derheqê dostekî me de hinek tişt gotine. Ez jî çûme cem û ev gotinên ku min bihîstin min jê pirs kirin. Piştî min got, dayê xwezî te jê re negota wê paşê van înkâr bike. Gava min wisa got dîya min wiha li min vegerand, ma ê sîran hilke pîvazan biçîne. Qasî ku min fêhm kir ji vê gotinê armanc ew e ku, hinek delîlên gotin û bûyeran hene. Mîrov nikare bi rehetî wan biguhere an jî ji holê rake.

❖ **Rindîyek ji min re kir, ew jî di çavê min re kir:**

Carcaran îhtîyaca mirovan bi hevdû çêdibe û mirov alîkarîya hevdû dike. Lê paşê hinek însan vê alîkarîyê îstîsmar dikin însanan dixin bin minetê û hinek kar û xebatên xwe bi wan didin kirin. Di rewşên wiha de ev gotinên pêşîyan tê bikaranîn.

❖ **Ger fêsad û ewan tunebana, Gur û mî wê bi hev re bigerîyana:**

Di vê gotina pêşîyan de bal tê kişandin ser fêsad û ewanan. Bi rastî pir caran problemên di navbera însanan de problemên sun'î ne, problemên dariştî ne. Ew jî bi destê kesên xêrnexwazan çêdibin. Yanî ger ev xêrnexwaz tune bin kesên ku weke diji-minan xuya dikin jî dibe ku li hev werin û bibin dost.

❖ **Yê binamûs ji namûsa xwe tirsîya, yê bînamûs got ji min tirsîya:**

Di jîyanê de hema bêje di navbera her kesî de ji ber hinek meseleyan niqaş çêdibin û însan li hev dikevin. Ev tiştêkî pir normal e. Lê di van niqaşan de însanên carîs û şerût, heq bin jî neheq bin jî ji gotinên xwe nayên xwarê. Ji ber vê

yekê kesên ku naxwazin mesele mezintir bibe û di nava civakê de nam û îtîbara wan xera bibe, heq bin jî dengê xwe kêmkirî û rêya xwe diguherînin. Lê pir caran ev tevgera van însanan ji aliyê ew kesên şerût ve xelet tên fêhm kirin û dibêjin: “Binêrin ji ber ku ez heq bûm wî dev ji doza xwe berda.” Di rewşên wiha de ev gotina pêşîyan tê şixulandin. Yanî yê binamûs ji bo ku nam û îtîbara wî, namûsa wî bigemar nebe dev ji doza xwe berdide, lê mixabin ev ji aliyê muxetebê wî ve xelet tê fêhmkirin û muxeteb dibêje: “Binêrin ji min tirsîya.”

❖ **Ronahîya dinê hîv û ro ye, şîrînîya dinê xwîşk û bira ye:**

Di vê gotinê de teşbîheke xweşik heye û bal dikşîne ser girîngîya malbatê. Însan li dinyayê çî qas xurt be jî him di demên zor û zehmet de him jî di demên xweş de hewcedarîya wî bi însanan çêdibe. Di demên zor de jî di demên xweş de jî mirov dixwaze şîn û şahîyên xwe bi însanan re parve bike. Helbet ew însan jî eqrebeyê mirov be baştir dibe. Lewra her kes bi dil û can û li şîn şahîyên her kesî xwedî dernakeve. Ji vê gotinê armanc ew e ku; ne ji hîv û royê be dinya her tim tarî ye, xwîşk û bira jî tune bin tu tehm û mane-ya dinyayê tune ye.

❖ **Rojên Xwedê mîna garsên hûrik in:**

Di Tirkî de miqabîlê vê biwêjê wiha ye: “Sayılı günler tez biter.” Carna ji bo xelasbûna karekî lazim e mirov li benda demekê be. Lê di demên wiha de west zor derbas dibe. Ev biwêj jî ji bo ku hêvîyê bide mirovan di demên wiha de tê şixulandin.

Egirdekfiroş

Yakup Aykaç

Li ber qeraxa behra Wanê me. Zivistan e. Di bixêriyê her malan de dû mîna maran hildikişê. Erdhej jixwe li wan dera birîndar kiriye, li ser wê jî komirên erzane û bajarê hedî hedî û birînê kûr dike. Mijêke tîr li ser behrê ye. Bayekî xweş tê. Lê dîsa jî roj dikare dilê mirov germ bike. Tîrêjên rojê li ser rûyê behrê diçilvîlin. Û cihê ku behr digihije asîman, roj ber bi avabûnê ve diçe.

Ez li vir çi digirim? Temam, hat bîra min. Îro hinek bêhna min teng bibû. Ji ber vê yekê hema sa'etek beriya paydosê, ji ofîsê derketim û hatim lengergehê. Lengergeha Wanê. Ciheke xweş e. Mirov li vir dikare hinek tenê bimîne û bêhna xwe vede. Halê xwe yê xemnak û kesergirtîbûyî ji behrê re vebêje. Belê, ez jî wîsa dikim.

Ewa qedera sa'etêke ez li vir im. Êdî dema çûyînê hatiye bawer kim. Li ser berfê bi gavên piçûk dimeşim, ber bi rawestgeha otobîsê ve diçim. Pey min, dewsa lingê min ên kûr dimîne. Tu dewsa ji bilî ya min nîne. Dimeşim û li dewsa lingê xwe nanêrim, wekî kûselekî pîr. Wa otobîs jî tê...

Ya rastî îro morîka siûdê bi min re nebû. Çend pîrsgirêkên mezin çêbû li ofîsê, kenew bayîsa wê meselê ez bûme. Bêşansî ya min! Lê dîsa jî di otobîsê de ji xwe re cihek dimînim. Aliyê çepê yekî simbêlboq rûniştiye. Wî nas nakim. Lê diyare ku hin tiştan aciz bûye. Dizivire li aliye min û bêdestûr, hinek jî bihêrs, dest bi axaftinê dikê; "li vê bajarê, dema ku hilbijartina şaredariyê tê, her kes derheqê partîyan de qise dike, kes nabêje yekî qenc bila qezenc bike" dibêje. Û bi vî awayî rojeva navbera me jî diyar dike.

"Kekê çi bû, çima wîsa hêrsî?" pîrs dikim. Ew jî dibêje; "Kekêcan, çawa hêrs nebim! Qasek berîya hingê min rojnamevanek dît. Rojnamevan ji xelkê dipîrsî: Pîrsgirêkên herî mezinên bajarê me ligorî te çîye?" dibêje.

Kena min pê tê. Nizanim çima, lê ev hersbûyîna wî merîvê simbêlboq, axaftina wî ji min re komîk tê. Ez jî bersiva wî didim: "Ka, çi nîne?"

Xazîl min pirs jê nekira. Merîvê simbêlboq he derd û kulen xwe ji min re vedibêje he giliyên xwe bi min dike. Dawiya xeberdana wî nayê. Acizbûna xwe jê re kifş nakim, xatirê xwe dixwazim û rawestgeheke nêzî sûkê peya dibim.

Li dijî bêdengiya lengergehê, geremo-leke mezin li sûkê heye. Hêlma ji devê mirovan derdikeve, xwe ji vê sirê eyan dike. Carna tevî dûxanê cixarê bilind dibe û têkilî hewayê dibe. Erdê berfeke heliyayî heye. Herî nota benûştê ji solê mirovan re zeliqî ye. Hin kes dibezin. Hin kes dimeşin. Ez xwe di nav wan de hinek acîz, westiyayî û perpût/bêhal dimînim. Hinek li ser piyan disekinim. Der û dora xwe mêze dikim. Ber dikanekê xirbe zarokê deh duwanzde salî bala min dikişîne û ber bi wî ve dimeşim.

Lingê wî de gîzmekî şîn. Delingê xwe xistiye nav gorê xwe. Gorê xwe yê dirayî jî heta jorê kişandîye. Şalê wî, ber çokê wî yê rastê pîne kiriye. Qoçikeke kevn li ser wî ye. Berê wî girtiye lê diyare ku fermara wî pêşiya qoçikê hetanî jorê negirtiye. Berstûka faykê wî jî serê xwe nav qoçikê re derxistiye.

Ser kasê fêkiya dezgehek vekirîye. Egirdekê¹ dayika xwe difiroşe. Dike gazî: “Egirdekên xweş, egirdekên toq, egirdekên meşhur ên Wanê...” Egirdekên kurikê bi laylonê ve pêçayîye û di nav sênî de ye. Deng lê kirina wî bi aramî didome:

- Egirdekên xweş. Egirdekên germ
- Birayên ‘ezîz kerem kin, tam bikin. Birçî nemînin...

Hin kesên ku li vir derbas dibin komî bera wî dibin. Kurik qet fedî nake, kê bibîne yê bêje ev der ne sûk e, qey mala wî ye. Xortê çeleng wisa dixuye ku gelek dîfireh e. Çavê her kesî li ser wî ye. Lê kes xwe lê danane. Kes hîç nabêje “ca ez egirdekî bikirim”.

Lê egirdekfiroş gelek caran rastî vê halê hatiye. Diyare ku xwe gelek caran ceribandîye.

1 **Egirdek:** Li hin deveran jê re dibêjin “bişî”. Bi hêvîrê çêdikin. Nav rûnê diqijilînin. Wekî kadê biçûk in. Berê kê biçûk cihêkî dût û dirêj, xurbetiyê an jî leşkeriyê hingê ji bona rêwitiyê çêdikirin û rêwî jî egirdekê xwe, li rê dixwar. Lewre xwarineke toq e, mirov zû zû birçî nabe.

Serê xwe wan dera gelek caran êşandîye. Dîsa dike gazî: “Kê egirdekî bikire, ji wî re qaîdekî bêjim, straneke xweş... fermo...”

Xortekî çavbelek tê, nêzî egirdekfiroş dibe û dibêje: “berê stran, paşê egirdek!”

Egirdekfiroş bi rûyekî bişîrîn bersîva wî dide: “ser serêmin, ser çavêmin...” û dest bi stranê dike:

Wa dîsa bû şev, xewa min nayê...

Wan şevên Wanê, sebra min nayê...

Êdî temam e. Her kes bala xwe daye vê kurikê dengdilsoj. Her kes hem hinek xemgîn dibe bi dengê wî yê dilêş hem jî dilgeş. Rûyê her kesî dikene vê saetê. Westa rojê demek wenda dibe. Ev stran îştaha her kesî vedike. Li vê derê hin kes du heb, hin kes sê heb, hin kes bestek egirdek dixwaze. Hinek diravê xwe dide û ser vê jî naxwaze. Hinek zêde zêde diravê wan egirdekan dide. Egirdek firoş dixwaze ku sîparîşa her kesî bi lez bigihîne...

Ohh xweş! Egirdek xilas dibin. Binê sênîyê tişteke nemaye xêncî hûrmûran. Bêhna egirdekfiroş wisa fireh dibe, qey dibêjî rihê wî ketîye cînetê. Ji kêfan devê wî diçe pişt guhên wî. Êdî riya malê hêdî hêdî dixuye...

Serêvarê, egirdekfiroş ji bo her kesî dibe kaniya şahiyê. Belê her kes berêvarê dixwaze hinek bikene, kamran be. Di vê zivistanê de piştî derketina ji karê, di bin vê berfê, sir û seqemê de her kes dil û hundirê xwe bi vê stranê, bi vê bişîrîna kurikê delal ve germ dike. Belê, ez jî wekî wan... Ne tengasiya rojê di bîramin de ye ne jî halê min ê kesergirtîbûyî. Çawa ku mirovek here sînemayê û filmek temaşa bike, ez jî niha di rewşeke wîsa de me. Dawiya filmê bi giranî xwe kifş dike.

Paşê xortê çeleng sênî ya xwe datîne ser serê xwe û bi bextewarî, devê wî de stran, diçe malê.

Wa dîsa bû şev, egirdekên min ret bû...

Wan rojên sar de, egirdek xweş bû...

Çîroka Helbesta “Payîza Paşîn” a Melayê Hezîn

Emin Agahdar

Rojek ji rojên payîza sala du hezar û sêzdan... Li Çewlikê dem û demsal li hev diqelibîn. War û wext bi hev re diketin seyrane. Bi hewayê xwe ye xweş û bi awa xwe ye bi tam, payîza îsal jî ji Çewlikiyan re xwe diyarî dikir. Dema ku telefona min lê ket hê ez li ser taştê bûm. Belê wext nêzî nîvro bû lê ji ber ku dawîya hetfê dem gelek bihurîbû. Min berê xwe da telefonê, min dît ku Mele Mistefa ye. Dibêje ku Melayê Hezîn hatiye gundên Adakliyê. Ev 15-20 roj e ku di nava gel de îrşadê dike him jî hesreta welêt a hundirê xwe dikewîne. Eger tu misaît bî em bi ‘ereba te herin wî bînin Çewlikê. Min go baş e, ez ê hema xwe girêdim û derkevîm.

Mele Mistefa zavayê Melayê Hezîn bû. Li cem wî feqîtfî jî kiribû. Gelek caran me li ser berhem, ‘ilm, têkoşîn û helbestên Melayê Hezîn gotûbêj kiribû. Çend caran min ew dîtibû jî. Lê dema dengê çûyîna cem wî kete guhê min, bi carekê heyecanekê xwe li min girt û weke ku ji zû ve ye ez li benda vê xeberê bim hêl kete canê min. Min xwe girêda û ez ketim rê. Ez û Mela Mistefa ketin rê. Me berî da gundên Adakliyê. Rê xweş bû. Her der hê ji havînê vala nebibû. Yanî payîzê xwe li herderê nepêçabû. Serê payîzê bû, lê seyda sernavê helbesta xwe weke “Payîza Paşîn” danîbû. Sûal ji helbestvanan nedihate kirin lewra.

Riyên ku em tê de diçûn, çem û kaniyên, çiya û newalên gund û beldeyên ku em di wan de dibuhurîn hestên Mele Mistefa yên xortaniyê bican dikirin. Di her riyekê de bîranîneke wî hebû. Weke ku nû jiyabe behsa feqîtiya xwe ya

berê dikir. Di nava riyên bê qîr û bê wasîte de zehmetên ku kişandibûn, serma ku di van rîyan de xwaribû, gundên ku ji wan tayin dixwestin, kitêbên ku hatibûn xwendin, dersên ku hatibûn dayîn, seydayê wî, hicra wî û hevalên wî yên feqîtiyê... yek bi yek di ber çavên Mele Mistefa re derbas dibû û weke bîranînekê xwe bi ‘erebeyê bera newala dide, ji newela ber kaşên çiyayan ve radipeliqî.

Hindik mabû ku em xwe bigihînin gundê ku Seyda lê ye. Di serî de me rê şaş kir û paşê em dîsa vegeyîyan û em hatin nava bexçê ku seyda û dost û gundiyên ku pê re ne. Firavîn hatibû xwarin û herkes ketibû suhbetê. Piştî ziyareta Seyda nasîn û xêrhatin hate kirin. Seyda pîrsa me kir. Me jî li halê wî û yên li der dora wî pîrsî. Hin hevalên Mele Mistefa hebûn lê wê derê. Ew tev ketibûn suhbetê. Li halê hev dipîrsîn û kêfxweşiyên xwe bi hev re dianîn. Di nava vê qelebalixa xweşsuhbetê de firavîn ji me re hat. Wan berî ku em bên xwaribûn. Me jî di nava wê cim’etê de firavîna xwe xwar. Di binê siya darên sêvan, di nava wê şenkayî û hênikahiyê de kêfeke bêpayan û şoleke menewî hebû.

Dema nimêja ‘esirê bû. Herkesî destnimêja xwe girt û seyda da dû cem’etê, me nimêja xwe ye ‘esir eda kir. Piştî vexwarina çay me xatir xwest, me seyda jî bi xwe re anî û em ketin rê. Xuyabû ku Seyda gelekî westiyabû. 15-20 rojên li gundan û bi mêvantî û tevî wî temenê dirêj Seyda westiyabû. Deng dernediket. Min diajot. Seyda li kêleka min. Piştî hin axaftinên rojane Seyda kete bédengiyekê. Piştî hingê Seyda dest bi qesîdeyekê kir. Dengê wî gelekî nizm

bû. Ji bo baş bibihîsim min paceyên ‘erebeyê jî girt. Tiştên ku dinehwirand nehatibû bihîstin. Meqamê ku pê xistibû jî gelekî bi huzn bû. Ji xwe mijara qesîdeyê jî gelekî bi huzn û keder bû. Min gelekî xwest ku bipirsim ka ev gotina yê kê ne. Lê min taqet nekir bipirsim. Mela Mistefa jî tiştek nepirsî. Seyda digot, me jî godarî dikir. Vêca em hatine Çewlikê, mala Mela Mistefa. Ez jî bi wan re çûm. Me çayek li mala Mele Mistefa jî vexwar. Di vê navberê de min ji Seyda pirsî ka ew qesîdeya ku we dixwend a kê ye. Seyda got ku ew ya min e. Min dîsa pirsî. Gelo ew di dîwana we de heye an na. Seyda got ku hema çawa hat min wisa ji we re xwend. Îja min ji Seyda rica kir ku derfeta wî hebe bila ji me re vê qesîdê binivîse û em jî di kovarê de biweşînin. Piştî suhbetê min xatir ji wan xwest û ez vegeyame malê. Du roj derbas bibû Mele Mistefa, Seyda bi rê kiribû û qesîde jî nivîsibû ji min re şandibû. Ez pir kêfxweş bûm ku ev helbest kete ser kaxezê. Helbesta Seyda li jêr e.

Payîza Paşîn

Mela Husnî Hezîn

Payîza paşîn e îro
Dilê min xemgîn e îro
Li min huzn û şîn e îro
Gelî dost û gelî yaran!

Li daran tev pelan zer kir
Kezeb û dil li min ker kir
Ji dostan dost û yar dîr kir
Gelî dost û gelî yaran!

Ji zozanan quling çûne
Gul û bilbil tune bûne
Warê vala mera şûn e
Gelî dost û gelî yaran!

Tenê mame di sehayê
Weka mecnûnê Leylayê
Şev û rojan me xew nayê
Gelî dost û gelî yaran!

Heval çûn menzîlê canan
Tenê mame li şûn konan
Li me pirs nakitin însanan
Gelî dost û gelî yaran!

Tenê mame li şûn waran
Dibarin hêstir wek baran
Ma napirsîn li me jaran
Gelî dost û gelî yaran!

Bihara ‘umrê qenc bûrî
Bi axîn û xem û dîr î
Giran bar e li me pîr î
Gelî dost û gelî yaran!

Dunê xwoş tê ji şêran ra
Ku ava kin ji xêran ra
Xo hadir kin ji bîran ra
Gelî dost û gelî yaran!

Dunê ne dostekî rast e
Ahîn tê da ne raweste
Diçin jê pale û hoste
Gelî dost û gelî yaran!

Dinê kezeb li me ker kir
Di ser da xwey jî pê wer kir
Li me can û cesed zer kir
Gelî dost û gelî yaran!



Gelek bajarî û gundî
‘Ereb Rûm û ‘Ecem Kurdî
Elemdar bûn bi vî derdî
Gelî dost û gelî yaran!

Gelek hatin gelek çûn e
Gelek mirin gelek bûn e
Herê! Dunya ne tu şûn e
Gelî dost û gelî yaran!

Hewar dikem hewar nayê
Di nîva sar û sermayê
Neçar mame li ber bayê
Gelî dost û gelî yaran!

Çima îro xuya nakin
Li miskînan ve pirs nakin
Xem û derdan bela nakin
Gelî dost û gelî yaran!

Xezala Berya Şenkalem
Ji bîr dîr im ku dikalim
Xerîb û jar û bê hal im
Gelî dost û gelî yaran!

Ku çer çûn menzilê canan
Gihîştin xaniy û xanan
Tenê mame li zozanan
Gelî dost û gelî yaran!

Hezîn im çav tijî xwîn im
Bi axîn û bi nalîn im
Hewarê bal we ve tînim
Gelî dost û gelî yaran!

Di'ayeke Cenabê 'Elî

Werger: Ömer CANGÎR

Ey Xwedayê qenciya wî zêde!

Ji Te re spasdar im.

Ey ma'budê yekta! Li ber Te xwe ditewînim.

Tu mezin î, ji nav evdê Xwe yê Tu dixwazî,
nîmetê bêhed didî.

Ê Tu dixwazî jî, bi ber dixî.

Ey Xwedayê min!

Xwe dispêrim Te.

Di dema hebûn û tunebûnê de li Te lava dikim,
li ber Te digirim.

Rastî gunehên min zêde ne, lê bexşa Te jê me-
zintir e.

Ji bêhevîbûnê re sedem tune.

Heke Tu jî min ji deriyê xwe biqewirînî, ez ê
xwe bispêrim kê?

Li benda kê bimînim?

Kê ji min re bibe şefe'atkar?

Ey Rebbê min!

Halê min dibînî.

Hêjarbûna min dizanî.

Lavabûna min a veşartî guhdarî dikî.

Min ji Xwe neke kesên bêhevî.

Li qisura min menêrî.

Hîn bêtir nese kinînî.

Nexe nav bêhevîbûnê.

Agirê evîna dilê min vêxe.

Min bi hezkirina Xwe têr bike.

Min bi muhbeta Xwe dagire Xwedayê min!

Li ber mezinbûna Te stuxwar kirim.

Ji te re mil danîm.

Çûm secdeyê.

Min di nav bexşa Xwe de bipêçî.

Ji 'ezabê Xwe biparêzî.

Dûr bihêle ji azaba Xwe.

Xwedawo!

Gava ji dinê rizgar bibim werim pêşberî Te, min
ji kilîma tewhîdê neqetînî.

Agirê Te jî, nûra Te jî xweş e.

Ji rehmeta Te hêvînekirin çi nexweş e!

Di wê roja sawdar ku mal û qurên bikêr nayên
de, dixazim bigihîjim bexşa Te.

Ji min re bexşa Te bes e, qenciya Xwe nîşan
bide.

Ya Reb!

Ku Tu rê nîşanî min bidî, tu gav riya xwe şaş nakim.

Ger Tu rê nîşanî min nedî, ez ê di şaşîyê de bimînîm.

Heke bexşandina Te tenê ji başan re be, kê xeraban bibexşîne?

Xwedayê her kesî Tu yî.

Ez ji umetê ne yê herî baş bim jî, ne yê herî xerab jî tîm hesabandin.

Xwe davêjim bexşa Te.

Ez mukur tîm, gunehê min mezin e, lê bexşa Te jê mezintir e.

Ku qenciya Te bibîr tînim, dile min dilxweş dibe.

Gava li gunehên xwe dihezirim, ji çavên min hêstir dibarin.

Tu li gora şayesteya navûdengê Xwe bikî.

Min bibexşînî.

Te ez wisa afirandim ku ji Te pê ve li kesî venegerim.

Hêviya min Tu yî. Lê fikra min jî ew e;

An ku Tu ji deriyê xwe berdî min ez ê biçim ku?

Xwedayê min!

Tu dibînî, xafil di xew de ne, ev 'evdê Te jî destên xwe vekiriye li ber Te digere.

Bila du'ayê min hilkişîne cem Te û niyazên min meqbûl bibin.

Herkes çî hêvî bike encex ji qenciya Te hêvî dike, her yekî dixwaze têkeve cennetê, Tu li bihuştê xuyanga xwe nîşanî min bide, ev ji min re bes e.

Ey Xwedayê ji bo riya rast nîşanî mirovan bide pêxember şandiye!

Tu bi rûmeta Resûlê Haşimî ke, Tu bi xatirê ew umeta ku Te tesbîh dike û teqdîs dike.

Me ji îmanê, ji Qur'anê, ji Îslamê neqetînî.

Bi misilmantî vejîne.

Ji pêxemberê Te şefe'etê hêvî dikim.

Me jê mehrum neke.

Ji Te 'ef û mexfîretê dixwazim.

Min vala venegerîne Xwedayê min!

Amîn.



Çavkanî : Fakîh Sahabiler Ve Mezhep İmamları- Osman Keskioğlu – Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları-Ankara-1972

AXAYOKÊ BÊDARÎ ŞA'IRÊ REXNEGIR

Tehsîn Îbrahîm Doskî

Latînîzekirin: M. Xalid Sadînî

Axayokê Bêdarî êk ji şa'irên xwidan şiyane û ji wan parçe şî'rên wî yên kêrêm heta nuke gehîştîne me dihête zanîn ku ewî destekê dirêj di vehandinê da hebûye, belê mixabin jîn û serhatiya wî heta nuke li ber me ya rohn û aşkera nîn e û berhemê wî bi temamî nehatiye dîtin û belavkirin. Bi tinê çend şî'r û parçe şî'rên kêrêm tê nebin.

AXAYOK KÎ BÛ Û KENGÎ JIYABÛ?

Dihête zanîn ku Axayok xelkê gundê Bêdarê ye û Bêdar gundekê devera Spayêrtê ye. Dikefte nêzîkî gundê Nûrsê (1) û Spayêrt nahîyeke ser bi qezaya Hîzanê ve ye li wîlayeta Bidlîsê û ew dikevte di navbera bajêrê Hîzan û Muksê da.

Jîn û serhatiya wî û esl û hêvênê wî bi berfirehî heta nuke nehatiye zanîn, belê ji wê şî'ra wî ya ku wî bi mirîna du kurên xwe ve vehandî, dihête zanîn ku ew li dorên sedsala diwazdê mişextî, hejdê zayînî jiyaye û ew di vê şî'ra xwe da aşkera diket ku du kurên wî pêkve, di rojeka meha Nîsanê da ku roja şenbiyê bû, li sala 1140 mişextî 1728 z. miribûn. Ew li cihekê dî ji şî'ra xwe aşkera diket ku kurekê wî yê sêzde salî bû û êk yê pazde salî bû. Me'na kêrêm kêrêm jiyê Axayokî li wê salê divê nêzîkî çilê bit... Û ji vê çendê aşkera dibit ku dîr nîn e bûna wî li dorên sala 1100 mişextî 1688z.be.

Ji wan parçe şî'rên wî yên me li vîrê kom kirîn bo me aşkera dibit ku Axayokî nasnavê xwe yê şî'rî kiribû "xeyn elîf" ku du herfên navê wî ne û dibit ew bi vê çendê yê daxbar bûye bi Feqiyê

Teyran ewê leqebê xwe kiriye "mîm û hê".

Ji vê çendê zêdetir heta nuke em tiştekî ji serhatiya wî nizanîn!

Axayok.. Şa'irê rexnegir:

Me got: heta nuke bi tinê sê çar şî'rekên Axayokî yên hatîne dîtin û şî'rên wî yên dî hêştê li bin toza jîbîrkirinê ne, di nav berperên berze da, ji edebê me yê klasîkî û ji wan şî'rên wî yên kêrêm aşkera dibit ku hesteka rexnegriyê li nik wî hebûye. Rexneya li zemanî û li kurên zemanî jî û wî dest û darê xirab yê li demê wî belav. Eve hindê digehînit ku Axayok ji wan şa'iran nebûye yên pişt daye waq'î û di hindek burc û kelatên xeyalî da jiyayî, belkî wî xem ji serrastkirina waq'î dixwar û bi çavê çakkirina dest û darên xirab berê xwe dida zemanî û xelkê zemanî jî..

Gelek şa'ir hene demê em şî'rên wan dixwînin, em dibînin ew tîrên kerba xwe di weşînine zemanî û her saloxetekê kirêtê hebe ew bi zemanî radiden û dibêjn: "Zemanê xayîne, wextê xirabe, dinya ya pûç e... û htd." Belkî mexseda gelek ji wan bi zemanî kurên zemanî bit, belê ji ber her egereka hebit ew vî mexseda xwe li pişt perdeyên kîneyet û mecazê vedşêrin û kêrêm şa'ir hene vî perdeyî ladiden û tîrên xwe êkser diweşînine xwidan sûçan.. Bi hizra min Axayok êk ji wan e.

Li vîrê em wî berhemê Axayokî li ber dest danîn yê ku di jêderên destnivîs û çapkirî jî da bi berçavên me keftî bi wê hîvîyê ku li paşerojê

AXAYOKÊ BÊDARÎ

berhemê wî yê dî jî ronahiyê bibînit.

Mirina herdu kurên wî:

Êk ji giringtirîn şî'rên Axayokî ew şî'r e ya wî bi hilkeftina mirina du kurên xwe, di êk rojê da vehandîn û giringiya wê ji hindê dihêt ew berperekê veşartî ji jîna vî şa'irî bo me aşkerâ diket. Bi me didete zanînê ku ew li sala 1140 mişextî yê zêndî bûyê û xwidan mal û 'eyal jî bû... Ev şî're Axayokî li meha Remezanê ji sala 1140 mişextî, Nîsana sala 1728 z. vehandiye têda dibêjit:

Sed mixabin vê cewabê ez ji dil nalan kirim

Taqet û qûwet nema min belkî ez bê can kirim

Leşkerê derdan geha min ji ,aqlî talan kirim

Min nema qet xew bi carek bê ser û saman kirim

Min du şahî çûne vêkra mubtelayê wan kirim

Wê dema mesmû'î min bû hicreta cuhtê kuran

Xem li ser pişta me hazir bûne barê oştiran

Satirî nabim ez tu car êdî ji vî barê giran (2)

Rîş û rih herdu me şil bûne ji ava hêstiran

Furqeta wan sorgulan ez bê 'eded giryan kirim

Ey Rebbî 'alem tu yî derdê li halê min pur e

Min ji xanî çûne vêkra rojekê cuhtê kur e

Ger weled ,ar e welakin ew li nik babî dur e

Cewherek xelkê biyanî bo me bûn şêrîn sure

Vê demê dîn û teles ez hewceyê dêran kirim (3)

Herdu rojan heq bi ser min ev musîbet aniye

Sal hezar û sed û çil çûne ji hecra ommî ye

Mahê Nîsanê ku roja reş li min bû şenbî ye

Lazim e herçî ku Heq kit em bi wî bin razî ye

Lêk van derd û xeman bê danîş û iz'an kirim (4)

Herdu rojan wan bi yek ra dayiye terka cehan

Yek di sala sêzdehê bû yek di sala pazdehan

Xwuzî ew herdu bigrîna li min ne ku ez li wan

Satirî nabim ez tu caran ji hesreta cuhtê kuran

Hicreta wan sorgulan ez bê 'eded giryan kirim

Qet ji dil naête der tîra di dil tîra kulab

Min birîna dil di dev da derbûye jê tê ,edab

Sîne ateş danî îro dil di wê da bû kebab (5)

Lew dinalim bê qiyas û lew dikalim bê hisab

Vê Gulanê ez ji seyra sorgul û werdan kirim

Min divêt ,Îsayî bibînim dê ji kû peyda bitin?

Min birîna dil xefe esseh bizan xweş nabitin

Dê bi derd û xem bimînim ta qiyamet rabitin

Ger di heşrê da bibînim wan ku dil pê şa bitin

Lê te ta "yewmelqiyame" munisê derdan kirim

Xeyn elîf beske ji nal û zarî waha derûn

Ew qezaya Barî ye ma kes li wê çu kit bi rûn

Sa'etek te'xîrî nabîtin "wela yesteqdemun"

Herçî Heq kit ew heqq e "Înna îleyhî racî'un"

Lê ji derd û hesretan ez bê ,eded giryan kirim 6

KUND JÎ BIRAYÊ BAZÎ YE..

Û REXNEKA DI CIHÊ XWE DA:

Şîreka klasîkî ya hêja heye ji du parçeyan pêk dihêt. Hindî hatiye dîtîn, şa'ir têda rexneyeka dijwar û di cihê xwe da bo hindek texeyên civakî araste diket; ewên durûyatîyê bi kar di înin û hewce naket em li dor naveroka vê şîrê baxivîn. Çunkî em wê bi xwe dê li ber destên xwandevanan danîn. Bi tinê min divêt bêjim: ev şî're bo çar kesan dihête paldan û diyarda paldana şî'rekê bo pitir ji şa'irekî di edebê me yê klasîkî da, gelek dihête dîtîn û dîr nîn e, yêk ji egerên belavbûna vê diyardê ew bit şa'irek da hêt û şî'ra şa'irekê berî xwe yan hevçaxê xwe bo xwe nivîsit, bêyî îşaretê bidete navê şa'irî... Û piştî wî kesekê di da hêt û wê şî'rê bi xetê wî bînit û da hizir ket ew şî'r ya wî şa'iriye û bo wî pal det, bi taybetî eger dûmahîya şî'rê ku nasnavê şa'irî têda dihêt, nehatî bit.

Ev şî'ra nuke dê veguhêzîn: “ KUND JÎ BIRAYÊ BAZÎYE” (7) yêk ji wan şî'rane yên bo van her çar şa'iran hatiye paldan: Axayokê Bêdarî û Mela Xelîlê Sêrtî û ‘Ebdrehman Axayê Şernexî, ewê bi nasnavê “Axayê Sor” dihête nasîn û bo Sa'iyê Hênî. Belê bi hizra min bi xwe ev şî'r e, pitir hejî Axayokî ye ji ber du egeran:

Êk: Deqê vê şî'rê di destnîsa Mela Xelîlê Sêrtî da hatiye ku li sala 1778 z. hatiye nivîsîn û Şêx Cuneydê Zûqeydî jî, wê ji Mela Xelîl vediguhêzit û dibêjit: “Min guh lê bûye ku ev şî're ji vehandina bapîrê min e her çende wî li ser nenvîsiye ku ew şî'r ya wî ye.”

Ez dibêjim: Her kesekê şî'rên Mela Xelîl xwandibin û ûslûbê wî dîtibit, dê zanit ev şî're gelek ya dîr e ji ûslûbê Mela Xelîlî...

Du: Sa'iyê Hênî û ‘Ebdrehmanê Şernexî, herdu jî piştî Mela Xelîlî ne û hebûna vê şî'rê bi xetê Mela Xelîlî hindê digehînt ku misoger ev şî're ne ya wan herduwan e û çunkî ew neya Mela Xelîl e

dê mînit Axayok bi tinê.

Hejiye bêtîn: ku ev şî're li ser kêşa “recza musemmen” hatiye danan û tef'îla çarê û heştê di her malkekê da ya bûye: “mustef'îlun” û dibit dûmahîya vê şî'rê keft bit; çunkî nasnavê şa'irî li dûmahîyê nehatiye û ‘edetê şa'irên me yên klasîkî ew bû wan navên xwe yan nasnavên xwe yên şî'rî li dûmahîya şî'rên xwe dînan.. Û ev şî're me ji van jêderan wergrîye:

A- yên desnîs: destnîsa Mela Xelîlê Sêrtî û ya şêx Cuneydê Zûqeydî û ya Mela Ehmedê Cewzî.

B- yên belavkirî: dîwana cam' ya Mela Ehmed Hilmiyê Qoxî û kitêba despêka xwendinê ya din. Kamîran Bedirxan û keşkola kurmançî ya Celîlê Celîl û kovara nûbharê gotara min. Murşid Tekîn jimara 71 şîbat 1999.

Kund jî birayê bazî ye eylok dibê: Terlan im ez 8

Sûret ji rengê zibî ye reşreş dibê: mercan im ez 9

Tawûs bi wî şeklê melîh şermende ye ji saqêd reş

Li wê qijka gûxwer binêr qijqij dîkit elwan im ez 10

Şêrê ji heft babê xwe şêr de'wa bi şêrtî nakitin

Tûlê pisê heft kûpekan ‘ew’ew dîkit eslan im ez 11

Qûnê neşet satir biket ‘ewret ji pirçê satir e

Li wî keçelê parsek binêr xaqan sîfet sultan im ez 12

Nanê cehî tîr naxwutîn tîstek di sîfrê da nîn e

Sînbêl û çavan bel dîkit, subaşıyê qewman im ez 13

Ferqa tehrî û Tahran ew ger nezanîtin çî ye

Şaş daye ser heft mêzeran go: Se'dê Teftazan im ez 14

* * *

Fezl û kemal û me'rîfet ger dê bi şaşa gir bitin

Cismê kulîndê ser mezin dê Qazî Beyzawî biya 15

AXAYOKÊ BÊDARÎ

46 ŞA'IRÊ REXNEGIR

Fezla terîqa Qadirî ger şeq şeq û hey hey bitin
Ew çeq çeqa aşî yeqîn dê Xewsê Geylanî biya 16
Fezla terîqa Neqşebend ger dê bi şorba gerim bi-
tin
Ew kefçiya şorbe di nav dê Şeyxê Bestamî biya
17
Fezl û kemala zahidan ger ew bi rih bihta wucûd
Ew nêriyê lihiye tewîl dê bê guman sûfî biya
Fezl û kemala sûfîyan ger fizfîz û hey hey bitin
Ew qîtka ser cemedê dê Şeyxê Sen'anî biya 18
Fezl û kemala feqiyan ger dê di medresê bitin
Ew delwika di ratiban dê Îmamê Şaf'î biya 19
Fezl û kemala 'abidan ger dê bi libsê sûf bitin
Qismê beranê pir hirî dê Qutbê Rebbanî biya
Fezl û kemala sûfîyan ger dê bi lerz û cezbe bî
Ew şûşeya zîbeq di nav dê Ehmedê Camî biya 20

Perawêz;

- 1- gundê zanayê navdar Mela Se'îdê Nûrsî
- 2- Satirî; rehet, aram
- 3- teles: mest û serxweş.
- 4- daniş: zanîn.
- 5- sîne: sing ateş: agir.

6- Ev şî'ra Axayokî me ji gotara seyda
'Abdualreqîb Yusûf wergirtiye, ewa di kovara
Rojî Kurdistan da belavbûyî, hijmara 50 li sala
1978.

7- Seydayê hêja Mihemed Emîn Bozarslanî,
gotarek bi navê "li ser du helbestên balkêş"
nivîsiye têda behsê vê şî'rê diket û ev gotare di
hijmara 73/74 ê da ji kovara Nûbiharê belavbûye
li nîsan / gulana sala 1999.

8- Kund: bum. E'lok: elhok, teyrekê nêçîrê ye
ji elhoyî biçûktir e û di daneya Cewzî da elkok
hatiye. Terlan: bazê mezin.

9 - Reşreş: reşreşk, ew dindika wekî kunciyê û
rengê wê yê reş.

10- qijik: teyrikeke reş û spî ye.

11- pis: kur, têşik, têtjik. Eslan: şêr.

12- Ev malke di daneya Cewzî bi tinê da ha-
tiye. Parsek: xazok, ewê destê xwe li ber xelkî
vedigirit. Xaqan: melik padîşah.

13- Li zemanê Osmaniyan digote serokê polîsên
bajêrî ewê bi şevê bajêr diparast: Subaşi.

14- Se'dê Teftazanî 712-793 k. yêk ji zanayên
navdar e, xelkê Xorasanê ye. Kitêbên wî li medre-
se û mizgeftên Kurdistanê dihatine xwendin.

15- Qazî Beyzawî ?-685 k. 'Ebdullahê Şîrazî,
zanayekê tefsîrê yê navdar e.

16- Xewsê Geylanî, mexsed pê Şêx 'Ebdilqadirê
Geylanî ye.

17- Di hindek daneyan "dîzka" li şûna "kefçi-
ya" hatiye. Ê Bestamî 188-261 k. Ebû Yezîd
sûfiyekê navdar e.

18- Ev malke jî di daneya cewzî bi tinê da ha-
tiye.

19- Di hindek daneyan de, ev malke bi vî rengi-
ye: "Fezl û kemala feqiyan ger bi bejna dirêj biya
/ Mislê minara Mûsilê dê bê guman feqî biya"

20- Ev herdu malikên dûmahiyê, di daneya Şêx
Cuneydî bi tinê da hatîne û Ehmedê Camî niza-
nim kî ye û aşkeraye ku Şêx û şa'irê Farisî, yê
navdar Camî, navê wî yê durist 'Ebdurrehman
e, ne ku Ehmed e.

SEYÎD ŞEFÎQ ARWASÎ

M. Emîn DEMÎR

Seyîd Şefîq Arwasî yek ji telebeyên Bedîuzzeman Se'îd Nûrsî ye. Jiyana wî jî wek ya Bedîuzzeman di xizmeta dîn û gelê wî de derbas bûye. Seyîd Şefîq pirsgirêkên netewê xwe piştguh nekirine û ji bo xizmeta gelê xwe xebatên siyasî, çandî û weşanê meşandine. Ew jî di jiyana xwe de rastî çarenûsiya rewşenbîrên Kurd hatiye. Wî jî wek rewşenbîrên Kurd nefitî, zindan û zext û zordarî dîtîye.

Seyîd Şefîq Arwasî di sala 1884' an de li gundê Permîs a Hîzana navçeya Bêdlîsê ji dayik bûye. Navê bavê wî Seyîd Şerîf û yê diya wî jî Nazdan e. Ji Arwasiyên Hîzanê ne û malbata wî nûnerên Terîqeta Neqşibendî yê herî girîng ê Kurdistanê bûn. Malbata wî şeş bira û du xwişk bûn; Seyîd 'Ebdulxefar, Seyîd Mihemed Mezher, Seyîd Emîr, Seyîd Sidîq, Seyîd Hecî Mîr, Seyîd 'Ebdulxaliq, Feyfûre Xanim û Hevze Xanim. Ji birayên wî Seyîd 'Ebdulxefar û Seyîd Mihemed Mezher li Bêdlîsê 'alimên bi bandor bûn û bi nasnameyên xwe yên Kurdewariyê jî navdar bûn.¹ Seyîd Şefîq jî ji hêla



Kurdewariyê de di bin bandora herdu birayên xwe û Bedî'uzzeman de maye. Zaroktiya Seyîd Şefîq li gundê Permîsê derbas bûye û perwerdeya xwe ya 'ewil ya dînî li gundê Permîsê ji birayê xwe yê mezin Seyîd 'Ebdulxefar standîye.

Di 7 – 8 saliya xwe de Quranê xitîm dike.² Seyîd Şefîq perwerdeya xwe ya medresê li Norşînê ji Şêx Mihemmed Dîyaûddîn û biraziyê wî Siltan

Weled dîtîye. Tehsîla xwe li medreseya li gundê Oxînê ya Bêdlîsê li cem Şêx 'Elauddîn tamam kiriye û îcazeta xwe jî ji wî standîye. Ji Şêx 'Elauddîn îcazeta terîqetê jî standîye. Şêx 'Elauddînê Oxînî ji Bedî'uzzeman ders standîye û lawê Şêx Fethulahê Werqanîsi ye.³ Piştî Oxînê li cem Bedî'uzzeman li Medreseya Xorxorê perwerdeya xwe didomîne. Li Xorxorê ji 200 feqeyî zêdetir kes hebûn û di nav wan de Kurdên navdar wek Hemzeyê Mîksî, Mihemed Mîhrî, 'Ebdulmecîd Nûrsî û 'Elî Çawîş hebûn. 'Elî Çawîş ji bo wan rojan di biranînên xwe de wiha dibêje: "Em li Medreseya Xorxorê di bin kelê de bûn. Feqî ji sê koman pêk dihatin. Yên nû, yên navîn û yên ku rûkara wan bilind bûn. Yên ku rûkara wan bilind bûn Bedî'uzzeman bi xwe ders dida wan. Ji yên navîn re xoce û seydayek tayîn kiribû. Dersên koma nû ya ku ez jî di nav wan de bûm feqeyên ku rûkara wan bilind bû didan..., Mamosteyê min yê 'asil, Seyîd Mele Şefîq Arwasî bû. Piştê ew bi hin

1Veysel Aydeniz, Seyid Şefik Arvasi, Weşanên Nûbihar, 2013, s 16-17-18

2Aydeniz, Jêdera Navborî, s 19

3Aydeniz, Jêdera Navborî, s 19

feqeyên xwe re çû Stenbolê.⁴

Hatina wî ya Stenbolê di salên 1912 – 1913'an de ye. Di sala 1913'an de beşdarî kongreya "Kurd Talebe Hêvî Cemiyeti" dibe.⁵ Ji ber wê tê zanîn ku Seyîd Şefîq di sala 1913'an de li Stenbolê bûye. Li Stenbolê ji bo ku ji Medreseya Fatîhê re 8 kesan bigirin azmûnekê vedikin. 800 kes beşdarî vê azmûnê dibin û ji van 8 kes kar dikan, ji wan 8 kesan yek jî Seyîd Şefîq Arwasî ye.⁶ Piştî ku di sala 1918'an de Medreseya Fatîhê diqedîne li vê medresê wek Seyda dest bi kar dike. Piştî Medreseya Fatîhê li Medreseya Suleymaniyeyê dest bi Seydatiyê dike. Seyîd Şefîq di beşên Tefsîr, Hedîs, Ūsûl'ul Hedîs, er-Risale, Tebaqatul Kurra, Tebaqatul Mufessîrîn de îcazetname standibû û jî Seyîd Se'îd û Şêx Mihemed Gulşen jî îcazetname Celwetiyê standibû.⁷ Seyîd Şefîq jî ber ku perwerdeyeke gelekî baş ji medresê standibû û zimanê 'Erebî û Farisî jî baş dizanibû di her warî de serkeftineke baş bi dest dixist û 'alimekî gelekî serkeftî bû. Seyîd Şefîq hevjinê xwe jî ji malbateke Kurdperwer hildibijêrîne. Bi Gul Xanima keça Seyîd 'Ebdulqadir Nûrî-el Berzencî yê ku ji malbata navdar ji Berzencyê Suleymaniyê ye re dizewice. Xezûrê wî Seyîd 'Ebdulqadir Nûrî-el Berzencî ji Darulfûnûnê re gerîndetî kiriye. Ji vê zewacê yek law yek keç du zarokên wan çêdibin. Navê lawê wan Mihemed Rifat Eryuvasi û yê keçikê jî Lamîa Eryuvasi. Mihemed Rifat Eryuvasi dibe bijîjk û di sala 1969'an de di qezayeke trafikê de wefat dike. M.Rifat bi Belqîs Eryuvasi re dizewice û bi navê Xetîce Dîdem û Gulumser Dîdar du keçikê wan çêdibin. Yê keça wî Lamîa jî bi navê Ehmed Underen lawekî wê çêdibe. Seyîd Şefîq piştî zagona paşnaviyê dixwaze ku paşnavê Arwas bistîne, lê ji ber çî ye em nizanin dûgel paşnavê 'Eryûvasi' dide wî. Di be ku karmendê gelheyê Arwas, Eryuvasi fêhm kiribe, angê dûgelê nexwestiye ku paşnavê Arwas bide wan.

Seyîd Şefîq di serhildana Şêx Se'îd de bi birayê xwe Seyîd Mezher û lawê wî re tê darizandin. Hemû kes li hêviyê ye ku Seyîd Şefîk were daleqandin, lê wisa nabe, birayê wî Seyîd Mezher û lawê wî yê 17 salî li 'El'ezîzê tîndaleqandin û

Seyîd Şefîq jî tê serbest berdan.⁸ Seyîd Şefîq piştî komarê jî ber zext û zordariya dest ji ber jiyana siyasi berdide û li Tekkeya Husrev Paşa bi karê dînî ve mijûl dibe. Di Miftîtiya Stenbolê de Serokatiya Şandeya Mûsxafan, 12 salan li Mizgefta Eyûbê, 25 salan li Mizgefta Siltan Ehmed sermelayîyê dike. Çil salî jî li Mizgefta Eyûbê wa'iztiyê dike. Di vê heyamê de jî gelek feqeyan dide xwendin û xizmetên giranbiha dike. Bi rewşanbîrên Kurd wek 'Ebdurrehîm Zapsû, Mihemed Mîhrî Hilav û 'alimê mezin Mele Sadrettîn Yuksel re hevaltiya xwe didomîne û wek teberruk îcazetê dide Mele Sadrettîn Yuksel.⁹

Xebatên Sîyasi

Xwendekarên Kurd yê zanîngeh û medreseyan di 9'ê Tebaxa 1912'an de li Stenbolê Kurd Telebe - Hêvî Cemiyeti damezirandin. Ji van xwendekarên Kurd yek jî Seyîd Şefîk Arwasî bû. Qedri Cemîlpaşa di "Doza Kurdistan"ê de 19 navên damezrînerên 'Kurd Talebe – Hêvî Cemiyet'ê dijmêre, di nav wan 19 navan de navê Seyîd Şefîq jî wek Şefîqê Arwasî nivîsandiye.¹⁰ Seyîd Şefîq beşdarî kongreya 'Kurd Talebe – Hêvî Cemiyeti' ya ku di sala 1913'an de hatiye lidarxistin bûye. Di kongreyê de hin rewşenbîrên Kurd dixwazin ku ciwanên Kurd tevî politîka û karên siyasî nebin. Rewşenbîrên wek Seyîd Şefîq, Xelîl Ramî û Şukrî Memet jî li dijî vê hizrê derdikevin û rexneyên tûj dikan, dibêjin: ji ber ku mezinên Kurd bi pirsgrîkên Kurdan re 'eleqeder nabin, ciwan mecbûr in bi siyasetê re 'eleqeder bibin. Seyîd Şefîq wexta ku 'Kurd Talebe – Hêvî Cemiyeti' hatiye damezrandin 28 salî bûye û di kongreyê de mafên Kurdan yê netewî parastine û bi ciwanan re beşdarî gelek çalakîyên cemiyetê bûye. Di beyannanmeya cemiyetê ku di kovara Jîn'ê hejmara 21 – 22' de hatiye weşandin de, armancên cemiyetê wanî tîndiyarkirin: Şandeyeke bi navê 'Şandeya Tamîmî Maarîf' bê avakirin ku Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, Dîwana Melayê Cizîrî çap bike û komkirin û weşandina berhemên 'Elî Herîrî, Feqiyê Teyran, Nalî, Mistefa Begê Kurdî, Şêx Qadir, Şêx Riza pêk bîne.

Ji xebatên Seyîd Şefîq yek jî "Kurdistan Te'alî Cemiyeti" ye. Damezrînerên vê cemiyetê

4Aydeniz, Jêdera Navborî, s 19

5Aydeniz, Jêdera Navborî, s 19

6Aydeniz, Jêdera Navborî, s 20

7Aydeniz, Jêdera Navborî, s 23

8Aydeniz, Jêdera Navborî, s 50.

9Aydeniz, Jêdera Navborî, s 79

10Aydeniz, Jêdera Navborî, s 30

rewşenbîrên wek Bedîuzzeman Se'îdê Kurdî, Seyîd 'Ebdulqadir, Hemzeyê Miksî, Xelîl Xeyalî bûn. Cemiyet ji bo parastina mafê Kurd û Kurdistanê û bi armanca bidestxistina berjewendiyên Kurdan yê gelemperî û hêskirina pêşvebirina wan, di 7'ê Qanûna 1918'an de hatiye avakirin. Seyîd Şefîq ji despêkê de di nav xebatên vê cemiyetê de cî girtiye û di nav tevgera neteweyî de peywirên gelekî girîng meşandine. Cemiyetê kovareke bi navê 'Jîn' derdixist û Seyîd Şefîq jî yek ji nivîskarên vê kovarê bû. Seyîd Şefîq di nav cemiyetê de alîgirê fikra xweseriyetê bû û bi ya wî wê Kurd bi awayekî xweser girêdayî xîlafeta Osmanî bûna.¹¹

Kovara Kurdistan û xebatên weşanê

Xebata Seyîd Şefîq ya herî girîng Kovara Kurdistan bû. Kovara Kurdistan ji hêla Kurd Tealî Cemiyeti ve dihat derxistin. Kovar di 31'ê Çileyê 1919'an de dest bi weşanê dike û Seyîd Şefîq jî Sernivîskarê kovarê ye. Di hejmara yekemîn de nivîseke bi navê "Mulehaza" û bi navê "Mihemed" jî ji dîwana Melayê Cizîrî beşek û şerxa wê, du nivîsê Seyîd Şefîq tîne weşandin. Kovara Kurdistanê tev de 37 hejmar tîne weşandin û di nava gelê Kurd de dibe sedema hişmendiyeke mezin.¹²

Dîwana Melayê Cizîrî cara 'ewil ji hêla Seyîd Şefîq ve tê çapkirin.¹³ Seyîd Şefîq jî berhemên Kurdî yê Klasîk Dîwana Melayê Cizîrî, Mewlûda Melayê Bateyî, Nûbihara Biçûkan a 'Ehmedê Xanî û berhema Mihemed Mîhrî Hîlav a bi navê "Mukaddîmet-ul Îrfan diweşîne. Seyîd Şefîq di salên 1912 û 1934'an de Mewlûda Melayê Bateyî du carên din çap dike. Ji bilî van berhemên Kurdî wergera pirtûkeke 'Erebî ya "Ebû Nasr Mihemed b. 'Elî" ya ku çil hedîsê Hz. Mihemed nivîsandîye werger û şerxa wan bo zimanê Tirkî dike.¹⁴

Bedîuzzeman û Seyîd Şefîq

Têkiliya Bedîuzzeman û Seyîd Şefîq li Wanê li Medreseya Xorxorê dest pê dike û heta roja mirinê didome. Seyîd Şefîq li Medreseya Xorxorê feqetiyê ji Bedîuzzeman re dike û di 'Kurdistan Te'alî Cemiyeti'de bi hev re dixebitin. Di

dema komarê de jî tîkiliyên wan didomin û di sala 1943'an de li girtîgeha Denîzliyê nêzî 9 mehan bi Bedîuzzeman re girtî dimîne.¹⁵ Ji ber ku 'Erebî û Farisiya wî gelekî baş e rastkirina hin Rîsaleyan Seyîd Şefîq dike. Bedîuzzeman bi 'Erebiya wî gelekî bawer e û di nameyên xwe de dixwaze ku Seyîd Şefîq kontrola hin Rîsaleyan bike. Di Lahîkaya Barlayê de dibêje ku bila Peyva 31. û ya 32. di bin kontrola Seyîd Şefîq re derbas bibin.¹⁶ Seyîd Şefîq xizmeta nivîsandina Rîsaleyan jî dike. Ji nivîsvanê Îşarat-ul Îcazê yek jî Seyîd Şefîq e.¹⁷ Bedîuzzeman di nameyeke xwe de wiha dibêje: "Gelo nivîskarê dawî yê Rîsaleyê Nûrê Şefîqê leheng sax e? Li ku derê ye? Meraq dikim".¹⁸ Bedîuzzeman di nameya xwe ya ku li Emîrdaxê nivîsiye de, ji bo Seyîd Şefîq wanî dibêje: "Em ji birayê xwe yê leheng ê berê Seyîd Şefîq re pir silav û du'a dikin."¹⁹ "Enver Baytan ê ku feqeyê Seyîd Şefîq e di bîranînên xwe de wanî dibêje: "Seyîd Şefîq 'alimê fîqhê yê her çar mezheban e."²⁰

Seyîd Şefîq salên xwe yê dawî di Tekkeya Husrev Paşa de derbas dike. Di sala 1969'an de piştî 45 salan tê ziyareta welatê xwe. Li Bêdlîs, Norşîn, Oxîn û Permîsê digere û malbat û hevalên xwe dibîne. Nêzikî wefata wî lawê wî yê bijîjk wefat dike, lêbelê ji ber ku xemgîn nebe mirina lawê wî 'ewilî jê vedişêrin. Piştî wexta ku tîne cem wî ji bo ku wefata lawê wî jê re bibêjin, yê ku hatine hîn dest bi şorkirinê nekirine Seyîd Şefîq ji wan re qala qiseya Hz. Yaqûb û Hz. Yûsif dike. Di salên dawî de xizmeta wî keça wî dike. Seyîd Şefîq di 13'yê Adara 1970'an de wefat dike û di 14 Adar 1970'an de ji welatê xwe yê ku jê pir hez dike ji Kurdistanê dûr li Stenbolê piştî nimêja wî li Mizgefta Siltan Ehmedê tê kirin li Edîmekapiyê li goristana Necatî Bey tê binaxkirin. Li wê derê hevalê xwe yê ku jê pir hez dike li kêleka 'Ebdurrehîm Zapsu radize.²¹

15Necmettin Şahiner, Bediuzzeman Said Nursiyi anlatıyor, Weşanên Nesil, s 54.

16Barla Lahikası, Söz Basım, s 346.

17Ayhan Işık, Bediuzzemanın Van Hayatı, Weşanên Şahdamar, s 41.

18Kastamonu Lahikası, Söz Basım, s 160.

19Emirdağ Lahikası, Söz Basım, s 89.

20Salih Okur, Ulemanın gözüyle Bediuzzeman, Weşanên Kayihan, s 406.

21Veysel Aydeniz, Seyid Şefik Arvasi, Weşanên Nûbihar, 2013, s 26 – 27 – 28 – 29.

11Aydeniz, Jêdera Navborî, s 32

12Aydeniz, Jêdera Navborî, s 39.

13İbrahim S. Işık, A dan Z ye Kürtler, Weşanên Nûbihar, s 61.

14Veysel Aydeniz, Seyid Şefik Arvasi, Weşanên Nûbihar, 2013, s 44 – 45.

Stewrên Xweşiyê

Hekîm RONÎYAR

Jana wan e ronahî
Mirina wan e delalî
Her dem ew li ser
Dilê dîlan
Dikin govenda bêdawî

Ro(h)n nabe
Dilê wan tu demî
Lewre j(ş)îna wan
Ava dike cûr be cûr
Dojehên hemdemî

Stewrên xweşiyê
Neyarê sira sibê
Reşiya dilê jînê
Tariya rûyê dinê
Stewrên xweşiyê

Stewrên xweşiyê
Yek bi yek çelmisandin
Gul û nêgizên ku dimêtin
Şîrê ro-n ji stêrên geşiyê

Stewrên Xweşiyê

METRAN¹ ÎSA YAN JÎ EVÎNA ‘ELIYÊ QOLEXAZÎ² Û MEYREMA FILE

Mehmet BOZKOYUN

Destana Metran di nava gelê Kurd de tê zanîn, pirr bi nav û deng e. Bi dehan wersiyonên vê destanê hene. Destana Metran ‘Îsa ya ku li cem min tomarkirî ye navê dengbêjê wê ne diyar e. Lê belê dengbêj destana Metran ‘Îsa bi sewteke xweş dibêje. Ji pey van agahiyên em derbasî destanê bibin³.

Dengbêj dibêje:

Metran ‘Îsa di Dêra Extermanê de dima. Meyrema File qîza keşe, bûka Sarkîs (Sarkîsî Meyrem xwestiye.) qîzeke gelek rind bûye. Navê wê li her derê welêt belav bûbû. Waliyê⁴ Wanê dibihîze ku Sarkîsî Meyrem xwestiye, xeberê dişîne ji bavê Meyremê re û dibêje ku:

- Meyrem bimre ji axê re ye, bimîne ji min re ye. Kesekî ku têkilî Meyremê bibe ez ê wî bikujim.

Ji tirsan Waliyê Wanê –ku zordestiya wî pir bûye- tu kesî nikaribû Meyremê bixwaze an jî qala Meyremê bike. Çend sal bi wî awayî derbas bûye. Rojekê Meyrem nameyekê ji walî re dişîne û dibêje:

- Xwedê mafê min ji te re nehêle. Nika tu li ser qedera min rûniştîyî. Ne tu min j’ xwe re dibî û ne tu destê xwe ji min didî paş ku ez li ser

qedera xwe, li ser nesîbê xwe herim. Madem ku wisa ye peyayekî xwe bi rê bike ez bi wî re werim bal te.

Dema ku name digihêje destê walî, walî difikire dibêje ez kê bişînim. (‘Eliyê Qolexazî jê re dibêjin, qerwaşê⁵ nava mala walî ye. Zilamekî pirr namûskar e, zilamekî rast û durust e.) Dibêje ez ê ‘Elî bişînim. Belê ‘Elî dişîne. ‘Elî wexta ku dê were Meyremê bibe, Meyrem çav li ‘Elî dikeve, Meyremê dil davêje ‘Elî, bi tenê ‘Elî zilamekî ku xizan bûye, cilên li ser wî rizyayî bûne Meyremê dibêje:

- Ez qîza keşe me û tu min ji waliyê Wanê re dibî, bi vî halê ha, ez bi te re nayê. Heger dirav⁶ li ser te tunebe ha j’ te re pere, here ser berber serê xwe, riya xwe kur bike. Here hemamê xwe pak bişo. Destekî kincên efendiyan li xwe bike û ez bi te re werim.

‘Elî diçe vê erkê tîne cih. Wextê ku ‘Elî vedigere, Meyremê çav li ‘Elî dikeve hîn zêdetir kêfa wê ji ‘Elî re tê. ‘Elî hîn qeşeng bûye. Meyremê dibêje ‘Elî xwe bide ber neynikê⁷, ‘Elî xwe dide ber neynikê, Meyremê xwe dide kêlekê, dibê: “ ‘Elî, ez qîzeke xweşik im, an jî tu xortekî rindî? ‘Elî dibêje: “estaxfîrûllah xatûna min, tu j’ min û bavê min zêde yî. Ez kê me tu kê yî?” Dibê ‘Elî laqirdiyan meke, welleh ez qîzeke rind im, tu jî xortekî bedew î. Tu yê min ji xwe re bibî.

¹Pîskopos

²Qolaxasî

³Destanê ez ji devê dengbêjê xwe dinivîsînim. (Mixabîn navê dengbêjê ne diyar e. Ez çiqas lê geriyam min navê wî bi dest nexist, lê dengê wî li cem min tomarkirî ye. Xwezî min navê dengbêjê bizanibûya û min binivîsanda.)

⁴Parêzgar

⁵Kesên ku xizmetkar be

⁶Pere

⁷Awêne, eyne

Dema wisa dibêje çogê⁸ ‘Elî dişkên. ‘Elî dibê, xatûna min, çi heqqê⁹ te li min heye, hîn dilê min bi dinyayê xweş e, hîn min tiştek nedîtiye, ez hîn xort im, tu zanî walî xedar e, eger ku ez, hêlîna xwe bibim asîmanê heftan jî walî, wê min bikuje. Çi heqqê te li min heye? Meyrem dibêje:

-‘Elî tu zanî, dema ku tu min ji xwe re nerevînî nebî, ez dema bigêjime cem walî, ez ê bêjim ‘Elî dest avêtiye min. Tu yê hingî xwe li ku de rê xelas bikî.

‘Elî li wê derkê kete nava xelîl û celîl. ‘Elî wê çawa bike? Got: “ez ê te bi ku de bibim?” Meyremê go “tu yê min bibî Dêra Extermanê bavêje tor û bextê Metran ‘Îsa.” (Piştî van gotinan dengbêj dest bi stranê dike û dibêje)

Ay lo delîlllll êêêêê ooooooyyyyy

Meyremê dibê ‘Elyo sibeye ooooooyyyyy

Gelo wayê mi go çi yî sibeka d’Îsa bi xêr û bêr e ooooooy

Sibê rabe qeyik¹⁰ û gemiyê¹¹ Metran ‘Îsa gelo l’ l hev girêde

Em ê xwe bavêjin tor û bextê Metran ‘Îsa di dêrê de êêêêê ooooooyyyyy

Hey la delîl delîl delîl delîl delîl delîl delîl tew lo lo dilooooo

Delîl delîl delîl delîl delîl lo l’ vî metranî

Metran ‘Îsa ji wî zemanî heya vî zemanî nav û dengê lo xwe deranî

Belê ‘Elyo dibê Meyremê sibeye êêêêê ooooooyyyyy

Gelo wayê mi go çi yî sibeka bi xêr û bêr e

⁸Çong

⁹Maf

¹⁰Kelek

¹¹Keştî

Min ê rabû qeyik û gemiyê Metran ‘Îsa temamî l’ hev girêdan

Belê ‘Eliyê Qolexazî rabû bi destê Meyrema File

Lê qîza keşe bûka Sarkîs dosta waliyê Wanê girt û m’ îrooooooyyyyy lo revandiyê

Erê xwe l’ Xwedê li nav û dengê Metranê Dêra Extermanê xwe girtye

Belê dibê sibeyeeee ooooooyyyyy

Gelo waye mi go çi yî sibeka zû ye

Metran ‘Îsa rabûye qesta Dêra Extermanê kiriyê

Lê bala xwe da reşekê li binê Dêra Extermanê êêêêê ooooooyyyyy lo sekiniye

Metran ‘Îsa dibê kuro şewa vê nivê şevê îşê¹² te yê l’ binê Dêra Extermanê li vir çi ye?

‘Elî dibê Metrano e çi bikim îro filetî ye

Minê rabû bi destê Meyrema File lê qîza keşe bûka Sarkîs dosta waliyê Wanê

girtim îrooooooyyyyy lo mi revandiyê

Minê xwe l’ Xwedê li nav û dengê Metranê Dêra Extermanê xwe girtiye

Eger îro tu yê Meyrema File li mahrkî¹³ li ser dînê Mûhemmed e

Sed aferîn ji nav û dengê te re

Eger tu mahr neke ez ê qebûl bikim dînê¹⁴ dînê lo Metran ‘Îsa

Hey la delîl delîl delîl delîl delîl delîl delîl tew lo lo dilooooo

¹²Kar

¹³Ev dera min bi dehan caran guhdarî kir lê mixabin min fêr nekir. Ez bawer dikim ku ‘Elî dibêje mahra min û Meyremê bibire li ser dînê Mûhemmed.(e.s.)

¹⁴Oî

Delîl delîl delîl delîl delîl lo l' vî metranî oo-
oooyyyyyy

Bila ji diya metranê Dêra Extermanê pêjde
kes¹⁵ nebêje mi çog da erdê ji xwe re lo kurek
anî

Metran 'Îsa ji wî zemanî heya vî zemanî nav û
dengê lo xwe deranî ooooooyyyyyy

Belê Metran 'Îsa dibê 'Elyo lawooooo oooo-
oyyyyyy

Lo wez wa nakim, wele nav û dengê Dêra
Extermanê kevn e mezin e ez xera nakim

Ez ê sêrê¹⁶ di nava dînê Mûhemmed de gelo
qet rast nakim

Ez ji bo xatirê kevnê jinekê dînê Mûhammed li
ber tu dîna zelûl nakim

Law ez ê îro gazî mellek¹⁷ û du heb feqiya kim

Ez ê bi qewlê Xwedê hed'Îsa Resûllûllah
bînim Meyrema File li te mahr kim

Hey la delîl delîl delîl delîl delîl delîl delîl tew
lo lo dilooooo

Delîl delîl delîl delîl delîl lo l' vî metranî oo-
oooyyyyyy

Erê bira bibê vî hogeçî lo l' vî beranî

Metran 'Îsa ji wî zemanî heya vî zemanî nav û
dengê lo xwe deranî ooooooyyyyyy

Belê dibê waliyê Wanê kaxezekî ji Metran 'Îsa
re bi rê kiriye

Walî dibê helê metrano d'Îsa aaaaa ooooooyyyyyy
lo di me d'Îsa

Mi dî du kevok ji ser¹⁸ Dêra
Extermanê ji xwe r' li cem Metran 'Îsa

¹⁵Ev gotina min lê zêde kir

¹⁶Wateya vê gotinê min nedît.

¹⁷meleyek, yek mele, mele

¹⁸Min ev der fêm nekir

Belê, tu herdu kevokan ji min re bigre bişîne
ez ê bidime te bi qederê hezar k'Îsa

Eger tu yê negrî neşîne ez ê bigrim kevr û
kuçêkên¹⁹ Dêra Extermanê li ser serê te de lo
lo werne xwar e ooooooyyyyyy

Hey la delîl delîl delîl delîl delîl delîl delîl delîl
şer ê vî metranîmîmîmî

Metran 'Îsa l' binê Dêra Extermanê ji xwe re
lo kemîn danî

Belê Metran 'Îsa dibê walyo lawoooooyyyyyy
lo wez metran im

Law ez kekê Bedra û Xena û Yewnan im

Ez ê îro bi kumê metraniyê bigrim li erdêxim

Ez ê leşa sawîn²⁰ Dêra Extermanê rakim

Lawo wele sibe la de file dikeve sûka û
çarşiyaye

Belê sibê wî çaxî 'Elî zava ye lo Meyrem bûk
e ooooooyyyyyy

Hey la delîl delîl delîl delîl delîl delîl delîl tew
lo lo dilooooo

Delîl delîl delîl delîl delîl lo l' vî metranî oo-
oooyyyyyy

Metran 'Îsa ji wî zemanî heya vî zemanî nav û
dengê lo xwe deranî ooooooyyyyyy

Metran 'Îsa waliyê Wanê têk dibe. Walî
vedigere Wanê. 'Eliyê Qolexazî û Meyremê bi
miradê xwe şa dibin.

¹⁹Kevirên biçûk

²⁰Ev der min fêm nekir.

Ji Rojnivîska Min: *Du Kitêb*

Meryem ERAY

Ji nava rûpelên kitêbê derdikevim û ber bi daristana pelzer dimeşim. Li dû xwe dîniherim ku min gelek rûpel sayî hiştine û gelek berg hişk û tel kirine. Dema ji nava rûpelên kitêbê derdikevim mîna ku evîna evdalekî bim dimeşim ber bi pelên darên ku bi usûl û 'esalet xwe bera ser ruyê 'erda pîroz û dadwer didin... mîna ku ez ji nava kitêbekê derkevim û têkevim nava kitêbeke din. Yek jê ji rûpelan ya din ji dar û beran.

Kitêba rûpelan ji min re gotibû derketina te bi xêr be. Lê bizanibe ku em herdu kitêb xûşk û bira ne. Rehm di dilê me herduyan de bi hev re li hev dide. Nivîskarê me jî yek e. Ew yek her wiha nivîskarê te ye jî. Ma tu jî ne perçeyekî ji vê kitêbê yî.

Daristana payîza mest bi hesret ez himbêz kirim. Dengê birayê wê çûbûyê. Loma ji min re digot ku birayê min rast dibêje. Tu jî rûpelekî û ez jî rûpelek im. Ji evîna kewn û mekanê em hatine

ketine nava vê kîtabê. Tu li min temaşa kî tu, ez li te temaşakim ez im. Tu ji min biqetî, tu yê wê çaxê bibî qet qetî. Lewra şîrêza ku rûpelên me bi hev re dirûtiye jî bi destekî hoste hatiye çekirin. Xwe neçirîne û nebe sedema jî-hevketina hevalên me jî. Te'dê li min jî neke.

Daristan dibîşirî. Kela girî kete qirika min. Min got yadê! Ev çi ne li ber min? Ev berhem, ev kitêb, ev behr, ev çol, ev daristan, ev wehşetgeh... weke ku nêzîk be lê ji dûr ve dengê diya min bi guhê rihê min ket:

"Na kurê min. Wehşet nîn e. Tenê te mêjiyê xwe hînî wehşetê kiriye. Te lalezarên hosteyên herdu kitêban weke wehşetzar hest kiriye. Kerem ke xwe bigihîne xwediyê keremê. Xwe neke tariyê. Fanûsan heqîqetê venemirîne. Ji xwe fanûsa nivîskarê perwerdekar li jorê ji rehma gencineya wî para te her roj ji te re dişîne. Bê navber. Bê pere. Bê adres. Bê tişt û mişt..."

Ma tu jî nizanî ku kitêba tu ji nav derketî ji te re çî got. Vege-re wê dîsa bixwîne û paşê dîsa bi 'eqîlê çavê xwe û bi çavê dilê xwe kitêba din bixwîne. Yek ji ya din ne cuda ye. Yek tefsîr e ji ya din re. Hevû dû şîrove dikin. Yek ji ya din ne mezintir e. Herdu jî ji nivîskarê xwe, agahiyan ji te re tîne. Behsa dîlovanî û mîhrîbaniya Wî dike. Qala başî û nabaşiyê dike. Şola rêveçûn û rêzanînê dike. Gotinên 'ecêb dide destê 'eqîlê te da ku tu ji wehşeta tarî derkevî qada ewlehiyên pîroz. Hevalên xwe yên riyê nas bikî. Da ku hemrahên te bi destê te û bi destê wan bigirin. Lewra kitêba 'ewil dibêje ku ew ê kitêba duwem wefat bike. Ma kitêba duwem ji te re negotibû ku tu jî rûpelekî hundirê min î."

PERWEDEHIYA RESÛLÊ XWEDÊ ‘ELEYHÎSELAM Û TESÎRA WÎ YA LI SER MALBATA WÎ

Îbrahîm MÎRZA

Nimînêrê herî mezin yê navê Cenabê Heq yê “Rebb”, Hz. Muhemmed ‘eleyhîselam e. Lewre ew, însanê fitretê ye. Helbet ên di bin terbiyeya wî de perwerde bûne, piştî pêxemberan, însanên herî bijarte ne. Ne mumkune ku li ser rûyê erdê yên wekî Ebûbekir, ‘Umer, ‘Usman û wekî ‘Elî (rediyellahû ‘enhûm) bên perwerdekirin û dîtin. Ne ew bitenê, ne mumkune mirov kesên wekî sehabîyan li ser rûyê dinê bi dest bixe. Lewre ew, yekser di bin perwerdehiya Resûlê Xwedê ‘eleyhîselam de mezin bûne. Dîsa gelek kesên din hene ku di bin perwerdehiya wî de mezin bûne û li aliyê pêşerojê ve çûne. Ew jî bi aliyekî ve ji aliyê Resûlê Xwedê ‘eleyhîselam ve hatine perwerdekirin.

Ew mirovên ku medarê îftixara mirovahiyê ne, perwerdekirina yên wekî wan di nav mercên îro de ne mumkune. Fudayl b. ‘Iyaz, Bişr-î Xefî, Beyezîdê Bistamî, Cuneydê Bexdadî, Îmam Ebû Henîfe, Îmam Şafî’î, Îmam Malik, Îmam Ehmed b. Henbel, Îmam Rebbanî, Îmam Xezzalî, Mewlana Celaleddîn Rûmî, Şahê Geylanî, Şazilî, Şahê Neqşîbend, Ehmed Rifa’î, Bedî’üzzeman... Belê xeynî wan, hê gelek kesên din li ber siya perwerdehiya Resûlê Ekrem perwerde bûne. Ev hemû, ji Resûlê Xwedê terbiye hildane û bi prensîbên terbiyeya wî perwerde bûne.

Hedîs nebe jî gotinek wiha xweşik heye. *‘Alimên ummeta min wekî pêxemberên Benî Îsrâîliyan in.*”¹

Di fezîleta gelemper de tu kes nagihîjin pêxemberan.

¹Îmam Suyûtî û Îbnî Hecer der heqê wê gotinê de wiha gotine; ‘eslê wê gotinê tine, ango ne hedîs e. Ev rîwayeta hane di kitêba ‘Eclûnî bi navê Keşful Xefa yê de derbas dibe c.2 r. 83.

Lê di hin fezîletên taybet de dibe ku hingî wan û an jî nêzî wan fezîletê bi dest bixin. Ev, ew ‘alimên me li jorê navê wan rêzkirî ji me re wekî bergeha şanaziyê ne. Ew, tu dibê qey ji bo ku rûyê erdê bişeref bikin hatine şandin. Heke em bixwazin cihê wan bi mexlûqek din tijî bikin, divê em ji asîmanan melaîketên Xwedê daxînin. Lewre ew, bi melaîketan ve hatine temsîl kirin.

Ev, keyfîyetek e û bitenê ji bo Resûlê Xwedê Muhemmed Mustefa (sellellahû ‘eleyhî wesellem) hatiye textsîs kirin. Ev, keyfîyetek e... Belê, encax întîsabek wiha fêkiyek wiha encam dide. Wê heta ebedê jî wiha fêkiyê bide. Piştî vê hişkahiya di serê me de derbas bûyî, kî dizane dê di pêşerojê de di nav wê civaka qudsîyan de çi qas berendamên van bijarteyan bên. Belê, bi aliyê sedeman de hêviya me cem wan e.

Niha ez dixwazim beriya edeba Resûlê Ekrem, qasekê li ser edebdayîna wî ya di malbata wî de bisekinim.

Bêgûman malbata wî, di destpêka kaînatê bigre heta îro, di nav malbatan de malbata herî bixêr, herî bextewar û herî bibereket bû.²

Di malbata wî de hertim bêhna bextewariyê dihat. Dibe ku malbata wî ji aliyê aborî û derfetê dinyewî ve malbata herî xizan bû. Lewre gelek caran meh dihatin û meh dibuhurîn di malbata wî de qet xwarinek an jî şorbeyek jî nedipijiya.

Maliyên Resûlê Ekrem, ango dayîkên me bitenê xwediyê odeyek biçûk bûn ku encax

²Buxarî, *hîbe* 1, *rîqaq* 17; Muslîm, *zuhd* 26, 28.

dikarîn tê de bisitirin. Ev dayîkên me yên bextewar, ji bo ku di hefteyekê de du sa'etan bi Resûlê Xwedê re derbas bikin hemî jiyana dinyayê feda dikirin. Lewre dayîkên me, jiyana bi Resûlê Xwedê re tercîhê hemî tiştan dikirin. Ew, him bextewar û him jî di nav aramiyê de bûn.

Resûlê Ekrem, ji kesên ku di bin berpirsiyariya wî de bûn re gelek peljen bû. Rêbaza wî ya terbiye û edebê ew li pêş hemî neferên malbata wî dabû hezkirin. Di dilê wan de 'eleqeyek mezin vekiribû. Piştî ew 'eleqeya di malbata wî de wekî pelên avê penc bi penc deng vedabû û heta belavî hemî cîhanê bibû. Belê, ew jî aliyekî fetaneta wî ya cuda bû.

Bifikirin ku gava Resûlê Xwedê wefat kiribû ji yek maliyeke xwe re jî yek dirhem ne tiştek ne jî avahiyek hiştibû. Di hemî jiyana xwe

vegeriyane.³

Lê, tiştê ku ez dixwazim li ser bisekinim ne ev e. Daxwaza min ev e ku ez ji we re terbiye û edeba dayîkên me ya ku ji Resûlê Ekrem sitandine bibêjim. Lewre Resûlê Xwedê, ji dayîkên me re terebiye û edebek bêhempa dabû qezenc kirin. Bi wan re terbiyeyek wisa di asta bilind de hebû ku di vê bihevrebûna jiyana wan ya kin de ew ji Resûlê Xwedê standibûn. Êdî ji xeynî Resûlê Xwedê tu tişt nedifikirîn. Hal ev e ku Resûlê Xwedê, di aliyê dinyayê de tiştê dayî wan ji xwe me li jor ji we re gotibû. Hal ev e ku di Resûlê Xwedê de cazîbeyek din hebû.

Mala Resûlê Xwedê, ji bo perwerdehiya hal û rewşên jinan wekî medreseyekê bû. Rewşên Resûlê Xwedê 'eleyhîselam yên taybet bi xêra vê medreseyê dihatin zanîn û piştî jî dîsa bi xêra vê medreseyê belavî nav gel dibûn.



de di odeyek biçûk de mabûn û di dawiyê de jî dîsa ji wan re ev odeya biçûk mabû. Gewreyê herdu cîhanan, di jiyana xwe ya dinyewî de bitenê ji maliyên xwe re ev odene temîn kiribû. Lê tu maliyên wî tu caran di jiyana xwe de dijberê wî halî tu tişt negotine. Tu kesî ji devê wan tu gilî nebihîstine. Di navberekê de tiştek nêzîkê wê hatibe hişê yek û duduyan jî bi hişyarkirina Qur'an'ê ve ji daxwazên xwe

Hukmên girêdayî jiyana malbatê ve ji sedî nod bi xêra dayîkên me yên paqij neqlî bal me ve hatine kirin. Ji bo vê jî, hebûna jinên xwediyê mertebeyên cuda pêwist bû.

Belê, pêwist bû ku di malbata Resûlê Xwedê de jin pir bin. Lewre mêran di mizgef-

³Sûretê Ehزاب, 28/33. Ji bo berfirehî bnr.: İbn Kesîr, Tefsîru'l-Qur'anî'l-'ezîm 3/481; Teberî, Camî'u'l-beyan 21/156.

ta wî de hertim ew guhdarî dikirin. Kêm zêde her axivînên Resûlê Xwedê dizanîn û an jî ji hevalên xwe dibihîstin. Wekî din gava neçûna suhbetek wî bi xêra hevalên xwe telaffî dikirin. Lê jin, bi gelemperî ji vê suhbetê mehrûm bûn. Lewre hertim derfetek wan nîn bû ku li Resûlê Xwedê guhdarî bikin. Herwiha wê çawa Resûlê Xwedê guhdar bikirana û di derbarê dînê xwe de agahdar bibûna? Bi taybetî jî di derbarê taybetmendiyên jinan de wê çawa hukmê dînê xwe fêr bibûna? Wê çawa agahdarê edeba Resûlê Xwedê ya di odeya wî ya razanê de bibûna? Wê kî edeb û exlaqê wî yê taybet ji me re neqil bikira? Gelo ji bo ku hemî distûrên dînî yên girêdayî jiyana misilmanan ya taybet, wê çava bi jinekî tenê bihata neqil kirin.

Bi aliyê beşeriyeta wan ve, jinên din çawa me'rûzê hin rewşên însanî dibin, ew jî wisa li hember rewşên cuda diman. Ji bo ku di wan deman de hukum bê tesîs kirin, divê ev hal di hin însanên din de jî bê zanîn. Ji ber vê qasê ji bo danîna hukum, jinekê têrê nedikir. Ango hukum bi tenê ser gotin û rewşek yek jinê nedihat tesîs kirin. Wekî din, ji bo ku wan rewşan neqil bike hêza jinekê tenê têra neqilkirinê nedikir.

Ji ber vê yêkê jî, pêwistiya jinekê hebû ku wan rewşên taybet hertim bibîne, pirs bike û hertim danûstandina wê bi Resûlê Xwedê re hebe û ji me re jî wiha neqil bike. Ev pêwistî qet girêdayî beşeriyeta Resûlê Xwedê nebû. Ev zerûret, bes dînî bû û di encama xwe de jî fêdeyek dînî ji misilmanan re hiştiye. Resûlê Xwedê jî hêj di destpêkê de fedakarî kiriye û ev pêwistî bi cî aniye.

Belê, hal ev e ku di wan zewacan de hewcedariya Resûlê Xwedê 'eleyhîselam ya cismanî tunebû –lewre di dewerek wekî 'Erebistana germ de hewcedariya cismanî zû qut dibe- ne jî hewcedariya dayîkên me bi aliyê cismaniyetê ve bi Resûlê Xwedê hebû. Hewcedariya dayîkên me bi aliyê dinyayê ve jî nîn bû. Lewre di malbata Resûlê Xwedê de jiyana, wekî jiyana malbatek xizan bû. Wekî din, Resûlê Xwedê bi wan re bi heqqaniyet tevdigeriya û mu'amele dikir. Serde, Resûlê Xwedê encax hefteyê carekê dikarî bi wan re bimîne. Lê, hertim, gava maliyên wî qala wî bikirana wiha dest

bi axiftina xwe dikirin: “Resûlê Xwedê di nav însanan de însanê herî xweşik û bi tevgera bi maliyên xwe re jî însanê herî zêde bi maliyên xwe re henek dikirin ew bû.”⁴

Jinên Resûlê Ekrem 'eleyhîselam bi rojan birçî diman û gelek caran jî ji bo xwarinê tu tişt bi dest nedixistin. Gelek caran jî ji bo lixwekirinê tu tişt bi dest nedixistin û bi mehan bi eynî kincan ve jiyana xwe berdewam dikirin. Niha ez tika dikim, gelo gilîkirin ne heqqê wan ê beşerî bû? Em di nav tevgerên wan de xeynî razîbûna ji Resûlê Xwedê pêve tu tiştî nabînin. Heke kesek rabe, dîrok û siyera Nebiyê Kerîm 'eleyhîselam lêkolîn bike wê bibîne ku di nav jiyana maliyên Resûlê Xwedê, ango dayîkên me de bitenê şikur heye.

Tevî hebûna muhbet û weqera di ruhê pêxemberiyê de Resûlê Ekrem, bi maliyên xwe re henek dikirin. Bi wan re danûstandin pêk dianî û bi wan re dibû yek. Di navbera wan de perdeyek tenik dima. Ew jî ji ber ku di navbera wî û rebbê wî de rêyek uxrewî hebû, sedem vê.. lewre ew, pêxember bû. Maliyên wî jî, beriya her tiştî kesên ji ummeta wî bûn.

Birastî, rewşa wan a piştî wefata Resûlê Ekrem 'eleyhîselam jî, hemî bi xemgînî, hicran û hesretê ve derbas bûye. Lewre em dibînin ku gava Hz. Ebû Bekir û Hz. 'Umer diçin ziyareta maliyên Resûlê Xwedê 'eleyhîselam, wan di nav xemgînî û rondik barandinê de dibînin. Heta gelek caran, ew jî rûdiniştin û bi wan re rondik dibarandin.

⁴Ibn Se'd, *et-Tebeqatu'l-kubra* 1/365; Suyûtî, *el-Camîu's-sexîr* s.131.

Îro Dîsa

Mehmet ACGÖZ

Dîsa dest pê dîkin bi peyvên sêwî û çavên kor
Dayik bibim bi romanên penaber û dilê roja sor
Jiyan hate dawiyê çû ‘imrê pûç hate min dor
Êdî rewê dawiyê da dil, ber bi mirinê diçe jor

Radibe dilê min da ser bendera xema keşkiyek
Nav têkoşînê de bûn leşkerên armanca min êdî danîne hemû çek
Bûye daristanek şewitî dilê min diçe gav bi gav êdî lêket şek
Nizanim gelo çima êdî tep dibe qesra evîna min yek bi yek

Çima dû re dilgeşî yadê çima ka min ra bibêj
Êdî qediya wextê min ra hate nasînê mam ez û êş
Nayê bîrkirin tu evînê nizanim çima dildayî hêj
Bûyî çavkaniya hezê qet dawî nabî wek ‘Edûl û Derwêş

Dicemidim yadê sar e bi hêza germahiya xwe min veşêre vê jîyana dijwar
Nav porê min da bigerîne destê xwe yê qelişî û hestê xwe yê neçar
Toriyan ferman nivîsî hat qeta min a mirinê oxir be hestên hêjar
Kes nizane welatê xwe da mam ceredeyek bê nasname û bê war

Dûr neçe were ramûsanekê deyne ser xeyala min ê vecinaq û kertî
Jiyana min a tewşî û nakokî xêz bike ser ruhên hestî
Ji nav çavên me da pirekê damezrîne tu rêwî ez girtî
Êdî miçiqîn hemû kanîyê min ê diltenik tu binîqut ser dilê tî

Ismê Te Yê Şîrîn

Mela ‘Elî BAQUSTANÎ
Tîpveguhezêr: M. Zahir ERTEKÎN

Ismê te yê şîrîn bûye mektûb di qidem da
Hubba te yê sabit di ufûqan lew şefeq da

Husna te yê zatî ku xelat bû ji te ra
Lutfa rebbê ‘alî ji ezel da di qedem da

Wesfê surrê zatê te çi bêjim ez xelet
Di cîhanê tuwî meşhûr wekî mahê berqe da

Bê hîsab û bê nîhayet me ku dunya ne teleb kir
‘Îşqa te yê sabit ku eser kir di ceger da

Weqta te nebînîm ah fîraqa rûsiya
Zewqa tehlî û murrê ez dibînîm di ‘esel da

Yexma ji me can bû ku fîraqa te me dî
Şemsa me ji ‘eksa bû zelum û di ‘edem da

Çi dema te ez meded kim tim ji ‘îşqa xwe yê saf
‘Usra mecella bit ger terefme te kerem da

Ji Xweda ra purrî minnet ku hebîbek daye me
Pur ‘ezîz û pur kerîm e lê di çehvê me remed da

Hakim tu wî îro tu li ser me bike ferman
Belkî ku eda kim her çî mayî te xeber da

Şahê li teref te ne ‘ezîz in dil û can
Canê me yê şîrîn her di fermana te da

‘Aşiq im her te dixwazim hazirê emrê te me
Canfîda tê me liqayê ez bi dergahê te da

Nazirê min tu be daîm hîviya bende ew e
Mehsûb bikî ‘asî tu di dîwana xwe da

‘Eyn û lam û ya mudamê ew recukarê te ye
Dest û zer’ê vê şîemê basitê ‘utba te da